




**MINISTÈRE
DE L'INTÉRIEUR**

*Liberté
Égalité
Fraternité*

WEZARETA KARÊ HUNDUR
Midûriyeta Giştî ya Biyaniyan a Fransa



Rêbername ya Serlêdana Penaberiye a Fransa



NAVEROK

1. Şêwen cûda yên parastinê.....	4
1.1. Statuya penaberiye.....	4
1.2. Parastina duyemîn.....	4
2. Pêvajoya gihandin û qeyd kirina serlêdana penaberiye.	5
2.1. Pêşwazî kirina yekem ya serlêderên penaber.	5
2.2. Qeyd kirina serlêdana penaberiye li gîşa yekem.	6
2.2.1. Qonaxa yekem: qeyd kirina serlêdana xwe ya penaberiye li walîtiye bikin.	6
■ Tespît kirina Dewleta ku ji lêniherîna daxwza serlêdana we ya penaberiye berpirsiyarê.	6
■ Berbijarî ya serlêdana we ya penaberiye.	7
■ Helbijartina zimanê axaftinê li OFPRA ye.	8
■ Dayîna belgeya serlêdana mafê penaberiye.	9
■ Ji bilf sedemên penaberiye ji ber hin derfetên din serlêdana rûniştinê.	10
2.2.2. Qonaxa duyemîn: nirxandin û yarmentiyên ji aliyê OFII ye tên dayin.	10
■ Piştgirtiyên we yên yarmentiyê li gorî pêwîstiyên we ên taybetî li gîşa yekemîn tê hesabandin.	10
■ Alîkariyên tên pêşniyar kirin.	11
2.3. Piştî derbas bûna gîşa yekem rêhevaltiya ku wê bê kirin.	11
3. Şertên lêniherîna serlêdaniya penaberiye12	
3.1. Lêniherîna ji aliyê Buroya parastina penaberan û kesên bê hemwelati ya fransa ye (OFPRA).	12
■ Dagirtina forma OFPRA ye.	12
■ Şandina dosyê ji OFPRA ye re.	12
■ Delîlên nasandina serlêdanê we ji hêla OFPRA ye ve.	13
■ Lêniherîna serlêdanê di nava pêvajoya normal an pêvajoya lezgîn.	13
■ Hevpeyvîna kesane li OFPRA ye.....	14
■ Lêniherînên bijîjkî.	15
■ Biryara OFPRA ye.	15
■ Li dijî biryara OFPRA ye îtiraz kirin.	16
■ Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA ye.	17
3.2. Lêniherîna Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA) 17	
■ Dem direhêjiya serlêdanê.....	17
■ Piştgiriya parêzerekî.	18
■ Îtiraz kirin.	18
■ Pejirandina wergirtina îtiraza.	19
■ Karakterên sekinandina îtirazê.....	19
■ Rûniştina li CNDA ye.	20
■ Biryara CNDA ye.	21
■ Piştî biryara CNDA ye dawî hatina mafê mayinê.	22
3.3. Ji nûve vekirina mafê serlêdana penaberiye ku hati bû girtin.	22
3.4. Ji nûve lêniherîn.....	22
4. Şert û mercên serlêderên penaber û mafê girtina materyalên pêşwazî kirinê24	
4.1. Cihên mayina serlêderên penaber.	24





■ Cihên mayinê.....	24
■ Şandina cihê mayinê.....	25
■ Pejirandin û derketina ji cihên mayinê.....	25
4.2. Alîkariya ji bo serlêderên penaber (ADA).....	26
■ Şertên ji bo sûd wergirtinê.....	26
■ Formûl kirina daxwazê.....	26
■ Mîqdarê alîkariyê.....	27
■ Çawa tê şandin.....	27
■ Îtiraz kirin.....	27
4.3. Gihandina perwerdê.....	28
4.4. Gihandina lêniherînên tenduristî.....	28
■ Li ku dermankirin di be?.....	28
■ Hûn çawa dikarin alîkariyê ji bo lêçûnên tenduristiya xwe bidest bixin?.....	29
4.5. Gihandina bazara xebatê.....	30
5. Di encamê red kirina serlêdana mafê we yê penaberiye û dawî hatina mafê mayina we li ser vê axê.....	31
5.1. Biryara red kirinê ji aliyê OFPRA an CNDA yê.....	31
■ Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê.....	31
■ Piştî ragihandina biryara CNDA yê dawî hatina mafê mayinê.....	33
5.2. Alîkariya ji bo vegera welatê xwe.....	34
5.3. Bi zorê vegera welatê xwe.....	35
6. Sûd wergirtina ji mafê parastinê.....	36
6.1. Mayina li Fransa.....	36
6.2. Mayina malbatê.....	36
■ Mafê mayîna endamên malbata we.....	36
■ Mafê hevbeşiya malbatê.....	37
6.3. Entegrasyon.....	38
■ Peymana Integrasyona bi Komarê li gel Buroya entegrasyona koçbera ya fransayê (OFII).....	38
6.4. Mafên civakî.....	38
■ Gihandina xanî.....	38
■ Gihandina bazara kar.....	38
■ Gihandina lêniherînê tenduristî.....	39
■ Berjewendiyên civakî û malbatî.....	39
6.5. Rêwîtiya derveyî welat.....	40
6.6. Hemwelatî.....	40
6.7. Dawî hatina parasitinê.....	41
ZÊDETIR: navnişanên pêwîst.....	42
1. Navnişanên niştîmanî.....	43
■ Sazî.....	43
■ Rêxistina navnetewî.....	43
■ Komel.....	43
2. Navnişanên herêmî.....	46
■ Gîşên yekemîn.....	46
■ Walîtî.....	48
■ Directions territoriales de l'Office français de l'immigration et de l'intégration (OFII) (Midûriyeta giştî a buroya entegrasyona koçbera a fransayê).....	53





1. Şêwen cûda yên parastinê

Gava ku hûn serlêdana penaberiye dikin, lêniherîna dosya wê dikevi bin berpirsiyariya Fransayê, serlêdana we ji hêla dezgehê parastinê ve tete lêkolîn kirin, ev jî dibin kontrola Buroya parastina penaberan û kesên bê hemwelati ya fransayê (OFPRA) û Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA) tê kirin.

Piştî lêkolîn kirina serlêdana we ya penaberiye û pêve, rayedarên parastinê dikarin parastina penaberiye bidin we: an wê ji we re statuya penaberiye an jî wê mafê sûd wergirtina ji parastina duyemîn bê dayîn.

1.1. Statuya penaberiye.

Statuya penaberiye dikare li ser sê bingehan ji we re bê dayîn:

- **li gorî peymana Cenevre** ya 28-ê Tîrmeha 1951-an ku têkildarî rewşa penaberan. Statuya penaberiye *"ji bo hemû kesên ku (...) ji ber nijada xwe,ol, netew, endamtiya xwe ya ji komekî an ji civakek taybet, an jî ji ber fikir û ramana xwe ya siyasî, ku li welatê wî ti ewlehiya wî ne mabi û ji ber vê rewşê ew li welatê xwe ne ma karîbî bimîne an jî, ji ber vê yekê ku ne karîbî daxwza parastinê ji welatê xwe bike tê dayîn"*;
- **"Destûra Bingehîn" a penaberiye**, di pêşgotina Destûra Bingehîn ya 1946 an, di paragrafa 4-de wanî tê destnîşankirin. Statuya penaberiye ji bo hemû *"kesên ku beşdarî çalakiyên azadiyê bûnin û ji ber vê yekê zilm û zordayi dîtinin tê dayîn"*;
- **Peywîrê Komîseriya Bilind a Penaberan ya Neteweyên Yekbûyî (HCR)**: heger ku we ji hêla HCR ê, hûn wekî penaber hatibin nasîn, statuya we li ser bingeha bendên 6 û 7 an tete qebulkirin.

1.2. Parastina duyemîn.

Parastina duyemîn ji bo hemû kesên ku rewşên wan ji bo şertên pejiwandina penaberiye têr nakê, lêbelê jiyana wan ji ber hin sedemên ciddî di bin xeteriyêdeye û van xeteriyana bi avayek vekirî îspat kiribin, û ku ji wan hatiye bawerkirin ku ew li welatê xwe dinava xetereyek mezindenin û yek ji êrîşên giran ên jêrîn dikişînin:

- biryara cezayê mirinê an darvekirinê;
- êşkence, ceza an jî nêzîkatiyên dervî mirovati yê;
- Di rewşa ku jiyana mirovan ya sivil û teybet ku ji ber hin sedemên wek, gefek ciddî û ji ber rewşek nakokiya çekdarî an şerê navxweyî an navneteweyî ku jiyana wanî şexsî di nava xeteriyêdeye û xeterek şîdete ciddî ku li ser wan hebe.

Statuya bê welatî

Ev statû li gorî Peymana New York ê ya 28 cotmeha 1954, ku têkildarî rewşa kesên ku bê welatin, û ji bo hemû kesên ku *"ji hêla ti dewletî ve wek hem welatî nayên hesabandin û ji ti qanûnên neteweyekî sûd wernagrin"* tê dayîn.

Ev statu ji du formên din ên parastinên ku li jor hatine diyarkirin cûda ye û pêvajoya serlêdanê wê ne wek pêvajoya penaberiye ye. Divê ji ber vê yekê hûn serî li walîtiyê nedin, lê rasterast serî li OFPRA yê





bidin, ku piştî lêkolîna serlêdana we bi dawî bû, dikari vê statuyê li ser konturola dadgeha îdarî bide we.

2. Pêvajoya gihandin û qeyd kirina serlêdana penaberiye.

Ji bo ku hûn serlêdana penaberiye li Fransa bikin, herî baş divê pêşî hûn herin saziyek pêşwazî kirina serlêderên penaber (SPADA), ji bo ku ew dikarin di derbarê Pevajoya penaberiye de we baş agahdar bikin, û divê ew ji bo we hevdîtinekê ji gîşa yekem bigrin da ku hûn karibin serlêdana xwe ya penaberiye bi awayek fermî bikin.

Li gîşa yekemîn serlêdana we ya penaberiye tê qeyd kirin, û di derbare parastina we, danîna alîkariyên henin, piştgirî dayina ji bo meşandina karên we, mercên pêşwazîkirinê, şertên dayina alîkariyên materyala tê kirin (cîhê mayinê, yarmentiya pêran ji bo serlêderên penaber).

Hûn di bin kî jan şertan de dikarin serlêdana rûniştina penaberiye bikin?

Hûn dikarin serî li mafê rûniştina serlêdana penaberiye bidin, ku rewşa mayina we li vir bi awayek fermî an ne fermî bê. Ketina we ya Fransa ku ne bi rêke fermî be, nayê wateya ku qeyd kirin û serlêdana we ya penaberiya bê asteng kirin.

Ketina we ya nava axa Fransayê ku bi vîze bi jî, dive ku hûn zûtirîn serî li serlêdana mafê penaberiye bidin û serlêdana xwe qeyd bikin. Ger ku piştî hatina we ya li Fransayê, di nava 90 rojî de hûn daxwaza xwe ya serlêdanê pêşkêş nekin, dibe ku daxwaza yarmentiyên we bê red kirin.

2.1. Pêşwazî kirina yekem ya serlêderên penaber.

Berî ku hûn biçin gîşa yekem ya ji bo serlêderên penaber (GUDA), divê hûn pêşî serî li saziya pêşwazî kirina serlêderên penaberiye (SPADA) bikin. Ev navendên yekemîn ên ji bo pêşwazî kirina serlêderên penaberin, prensîbê van navendan ewe ku ji hêla komeleyan ve têne bi rêvebirin, erkê wan ewe ku alîkariya we ya serlêdaniya penaberiye bikin û pevajoya wê bi we bidin naskirin.

Ev pêşwazî kirinê yekem dibin berpirsiyarî ya van operatora denin:

- divê ku di derbarê pevajoya serlêdana penaberiye de we agahdar bikin;
- li ser bingeha agahdariyên di derbarê rewşa we de, forma yekem a qeyd kirina serlêdana we ya penaberiye bi şewayê enformatîk çê dikin;
- divê ji gîşa yekem ji bo qeyd kirina serlêdana we ya penaberiye hevdîtinekê bigrin. Divê cîh, roj û seata wê û hûn ê çawa bi karibin biçin nîşanî we bidin, divê ku hûn di dema xwe de li gîşa yekem amade bin. Li gora prensîba ev serlêdan, piştî gihandina we ya van operatora 3 rojan û pêve pêk tê. Di rewşek ku qebralixî zêde be, di be ku 10 roj jî bi dome;
- wêneyên şexsî ên ji bo nasnameyê pêwîste amade bikin, wê li gîşa yekem ji we bê xwestin.

Tevahiya dosya wê bi awayek enformatîk tê qeyd kirin û ji bo gîşa yekem tê şandin.

BALDARÎ: Divê ku hûn hişyarî seat û roja ku ji bo hevdîtinê ji were hatiyê dayin bin û li wir amade bin. Di rewşa ku hûn dereng herin, hûn nayên pêşwazîkirin û hûn neçar in ku ji nûve xwe bigihînin navenda yekem a pêşwaziyê ku karibin ji nû de hevdîtinekê din ji we re bigrin.

Ger we cîh li Navenda Pêşwazîkirina Serlêderên Penaber (CADA) û navendên din ên cîhê mayinê peyda nekir, hûn dikarin serî li SPADA yê bidin ew di heman demê jî bi cîh kirina we berpirsiyarin û di destpêka





serlêdana we ya li gîşa yekemîn, ku hûn qeyda xwe çê di kin yekser daxwaza cîh bikin (li sernava "Hûn çawa karin navnîşana xwe piştrast bikin?" di nava beşa 2.2.1 binhêrin).

2.2. Qeyd kirina serlêdana penaberiyê li gîşa yekem.

Ji bo hûn serlêdana xwe ya penaberiyê qeyd bikin, divê li gorî agahdariya nivîskî ku ji hêla SPADA ji were hatiye dayin, divê hûn biçin gîşa yekemîn (li beşa 2.1 binhêrin).

Hûnê li gîşa yekemîn ji hêla nûnerên walîtiyê û nûnerên Buroya entegrasiyona koçbera ya fransayê (OFII) ku pêk tê, hûn ê werin pêşwazî kirin, wê civînek taybetî ji bo hatin û pêşwazî kirina we piştrast bike wê bê kirin.

Li seranserî vê xakê 33 gîşên yekemîn li nava bajarên mezin henin (hûn dikarin van navnîşana li ser pêşnûmayê zêdetir bibînin).

Hevdîtina li gîşa yekemîn ji du qonaxa pêk tê:

- qonaxa yekem bi nûnerên walîtiyê, ji bo qeyd kirina serlêdana we (2.2.1);
- qonaxa duyemîn bi nûnerên OFII yê re pêk tê, ji bo bi cîh kirin û alîkariyên ku wê ji we re e bê dayin tê destnîşankirin (2.2.2).

Ji bo qeyd kirina serlêdana we ya penaberiyê û nameyên ku ji we re tê pêwîstê navnîşanek we hebi?

Ji bo qeyd kirina serlêdana we ya penaberiyê, pêwîste ku hûn malakê bidin (navnîşanek postayî) destnîşankirin.

Ev ji bo nû kirina belgeya serlêdaniya we ya penaberiyê pêwîste (li beşa 2.2.1" dayina belgeya serlêdana mafê penaberiyê" binhêrin).

2.2.1. Qonaxa yekem: qeyd kirina serlêdana xwe ya penaberiyê li walîtiye bikin.

Ku zarokên we yê bi temenê biçûk li gel we bin?

Ger ku zarokên we yê bi temenê biçûk li gel we bin, wê qeyd kirina van zarokan li ser belgeya we ya serlêdaniya penaberiyê bê kirin û li ser belgeya we ev diyar bibe. Ger ku dê û bav her du jî serlêdana penaberiyê kiribin, wê zarok li ser belgeya dayika xwe bînin qeyd kirin, lêbelê di domandina prosedurê her du jî wekî berpirsiyarê zarokan tînin hesabandin. Ev ne belge ya ku koma malbata we diyar dike, pêşde çûna serlêdaniya we ya penaberiyê destnîşan dike.

■ **Tespîtkirina Dewleta ku ji lêniherîna daxwaza serlêdana we ya penaberiyê berpirsiyarê.**

Piştî ku bir rêka saziya yekemîn a pêşwazî kirinê, we di derbarê xwe de agahî da nûnerên walîtiyê ê ku li gîşa yekemîn, ku ev agahî ji hela nûner hate piştrast kirin û pêve, diyar dibe ka Fransa ji serlêdana we ya penaberiyê berpirsiyare an na.

Ger ku hûn ji 14 salî û mezintir bin, wê ji her deh tiliyên we tilipandinê bê girtin û hevpeyivînek kesane bi we re tê pêk anîn, ji bo şopandina rêwîtiya we ji derketina welatê we û heta hatina we ya vir, û ku girêdanek we ên malbatî bi kesek din ku li Dewletên din ên Endam di mîne hebe hûn ê bi karibin li wir bînin parastin .





Ev li ser bingeha welatê ku ji serlêdana we ya penaberiyê berpirsiyarê û li gora rêzîknameya Parlamento û Konseya Ewropî ya ku 26-ê Hezîrana 2013 bi hejmara 604/2013 da, ku ji bo prosedura Dublîna III ve hatiye destnîşankirin tê meşandin.

Dewletên ku bi Dublîna III an tekîldarin

Ev 28 dewletên endamên Yekîtiya Ewropa yê ne: Elmanya, Avusturya, Belçîka, Bulgaristan, Xîrvat, Qîbrîs, Danîmarka*, Spanya, Estonya, Fînlanda, Fransa, Yewnanîstan, Macarîstan, Îrlanda, Îtalya, Letonya, Lîtvanya, Luksembûrg, Malta, Hollanda, Polonya, Portekîz, Komara Çek, Romanya, Brîtanya, Slovakya, Slovenya û Swed û çar dewletên têkildar: Îslanda, Norwêc, Swîsre û Lîxtînştayn .

* Tekîliyê Danîmarka bi rêzîknameya "Dublîna III" tûneye, lê peymanê Dublînê, a ku di 15 Hezîrana sala-1990 de îmzekirî yê, hîn didome.

Di bê ku, ji dervî Fransayê yek ji Dewletên din ên Ewropî, ji daxwaza serlêdana we ya penaberiyê berpirsiyarbi, mînak:

- ger ku dewletek din yê endam ji we re destûra mafê rûniştinê an vîzek dabe;
- ger ku hatina we ya nava vê axê bi awayek qaçax bi û we sînorên Dewletên endam bi awayêk qaçaxî derbas kiribe, sînorê erd, hewa an deryayê;
- ger ku hûn bi qaçaxî ketibin nava axa Dewleta yekemîn a Yekîtiya Ewropa, ku we yekser sînorê vê Dewleta endam derbas kiribe, an jî we vîze girti be;
- ger ku we serlêdaniya penaberiyê li welatîk din ên endam kiribe.

Dibe ku lêniherîna serlêdana we ya penaberiyê di bin berpirsiyarê Dewletek din ên endam de bi?

Prosedura "Dublîna III" wê bê pêkanîn. Walîtî wê bi Dewleta ku ji we bipirsiyare tê keve tekîliyê û wê daxwaza ku bi rewşa we re eleqedar bibe wê jê bike. Wê belgeyek ku ji bo serlêdana we ya penaberiyê a mehek ê ji were bê dayin, paştê her ji çar mehan carek tê nûve kirin, bi vê belgeyê destûra we ya mayîna li ser axa Fransayê tê dayin, heya ku şandina we ya ji bo Dewleta berpirsiyar bê te kirin.

Ev şandina we, ji hêla servîsa walîtîyê wê bê bi rêxistin kirin, ku biryara şandina we hate dayin û pêve hûn ê di derbarê şertên çûyînê de bînin agahdar kirin. Ji bo îtiraz kirina vê biryarê divê di nava 15 rojan de hûn serî li dadgeha îdarî bidin.

■ **Berbijarî ya serlêdana we ya penaberiyê.**

Ger ku lêniherîna serlêdana we ya penaberiyê dibin berbirsiyariya Fransayê de bi, ji vê lêniherînê OFPRA berpirsiyare, dibe ev lêniherîn di nava prosedura normal an jî ya lezgîn bê meşandin. Prensîpê sînorê lêniherîna OFPRA yê ji bo pêvajoya lezgîn, 15 roj kêmtire, lê di her du pêvajoyan de garantî yekî.

- **Serlêdana we bi awayek otomatîk di kevi nava prosedûra lezgîn,** li gîşên yekem di du rewşan de ev tê qeyd kirin:
 - ku hemwelatî ya we ji welatek ewle tê hesibandin (navên van welatan li ser lîstê an li ser malpera OFPRA tê peyda kirin);
 - gava ku daxwaza we ya yekem a serlêdaniya penaberiyê ku bi tevahî hate bi red kirin, û ku hûn dixwazin carek din lêniherîna serlêdana we ji nû de di berçavan re bê derbaskirin.





- **Serlêdana we dibe ku tê kevi nava pêvajoya lezgîn**, ev jî li gîşa yekem li gorî van rewşên jêrîne:
 - ger hûn ne hêlin ku şopa tiliyên we bîn girtin;
 - ger hûn belgeyên sexte pêşkêş bikin, agahdariyên ne rast an veşartî dayina rayedaran û bi vî awayî hûn bixwazin wan bi xapînin;
 - ger di bin nasnameyên cûda, cûda we serlêdan kiribe;
 - ger ku serlêdana we ya penaberiya piştî ketina we ya Fransa (zêdetirî 90 rojî bê û li grava Guyane 60 rojî) bêtirbe;
 - ger serlêdana we ya penaberiya tenê ji bo têkbirina pîvanek berbiçav ê derxistinê be;
 - ger hebûna we tehlûkeyek ciddî ji bo nîzama giştî, û ewlehiya giştî an ewlekariya dewletê dike.

OFPPA dikari serlêdana we têxe nava pêvajoya normal, ji bilî ku serlêdana we ji ber hin sedemên berbiçav ên ewlehiya giştî kû tehdît dike û ji ber vê sedemeye ku hûn ketinin nava pêvajoya lezgîn.

Ger pêvajoya serlêdana we ya penaberiya ketibe nava prosedura lezgîn, we çend kopî ên di derbarê biryarê we de ku hûn bîn agahdari kirin wê ji we re bê dayin. Piştî ku OFPPA serlêdana we ya penaberiya red kir, û li dijî vê biryara OFPPA yê hûn serlêdana îtirazê li CNDA yê dikin, baştire ku hûn kopî yek ên van belgan jî bişînin.

Rewşên taybet: Ku biryara dersînorkirinê ji we re hatibe dayin, qadexa mayîne we li ser vê axê hebe û ev biryar ji hêla rêveberî an dadgeha îdarî ve hatibi destnîşan kirin?

Ku biryara derxistinê di derbarê we de hatibi dayin, li pêşiya qeydkirina daxwaza serlêdana we ya penaberiya ev biryar nabe asteng.

Ger Fransa ji serlêdana we ya penaberiya berpirsiyarbe, û ku hûn hatibin girtin an jî hûn li malê di binçav de bin.

Di rewşêk wihade, OFPPA piştî girtin an jî binçav kirina we û pêve, di nav demek kurt (96 seata) de daxwazê we ya serlêdanê lêkolîn dike. Ku daxwaza serlêdana we hate red kirin, û pêve mafê we yê mayîne li ser vê axê di qede. Dema ku CNDA îtiraza biryara we di berçawan derbas dike, hûn dikarin, di nava 48 seatan de ji bo sekinandina biryara dersînorkirinê, serî li dadgeha îdarî bidin (li beşa 5.1 binhêrin).

■ Helbijartina zimanê axaftinê li OFPPA yê.

Ger Fransa ji lêniherîna serlêdana we ya penaberiya berpirsiyarbe, piştî ku we daxwaza xwe ya nivîskî ji OFPPA yê re şand û pêve, ji bilî îstîsnayan, OFPPA ji bo ku hevpeyvînek kesane bi we re pêk bîne wê gazî we bike.

Divê ku di dema serlêdana xwe ya penaberiya, zimanê ku hûn dixwazin li OFPPA yê biaxifin helbijêrin û di heman demede qeyd bikin. OFPPA zêdetirî 115 zimanana ji we re pêşkêş dike û bi zimanê ku hûn daxwaz dikin hûn ê bîn guhdar kirin. Hûn ne di karin vê helbijartina xwe paşde bugherînin û ev zimanê ku we helbijartiye wê di tevahiya pêvajoya penaberiya we de bê bikar anîn.

Ger we di belgeya agahdariya de zimanê axaftinê ne helbijarti be, bi zimanê ku hûn baş di zanin hûn ê bîn guhdarkirin.

Ger hûn dixwazin zimanê ku di pêvajoya serlêdana we de hatiye helbijartin biguherînin, hûn tenê di karin di dema îtiraza ku we li pêş berî CNDA yê ji bo rawestandina biryara OFPPA yê kiriye daxwaz bikin.





BALDARÎ: Li gora demdirêjî û navaroka hevpeyivîna li OFPRA yê pêdiviya we bi zimanekî ku hûn baş dizanin heye. Girînge ku zimanê we helbijartiyê hûn baş fêhm bikin û hûn bikaribin xwe bi wî zimanî pir baş bînin ziman.

■ Dayina belgeya serlêdana mafê penaberiye.

Piştî Dewleta ji we berpirsiyar hate destnîşan kirin û qeyd kirina pêvajoya serlêdana we ya penaberiye, hûn ê belgeyek a serlêdana penaberiye werbigirin.

Dema ku lêniherîna serlêdana we ya penaberiye di bin berpirsiya yek ji Dewletên endam de be, wê demdirejîya belge we ya yekemîn ji bo yek meh ê be. Ew ji bo çar mehan tê nû kirin (li beşa 2.2.1 "Tespît kirina Dewleta ku ji lêniherîna daxwza serlêdana we ya penaberiye berpirsiyarê" binhêrin).

Dema ku serlêdana we ya penaberiye di bin berpirsiyariya Fransayê de be, wê belgeyek yekem a serlêdana penaberiye ku ji bo mehekê wê ji we re bê dayîn. Derbasdariya vê belgeyê:

- di pêvajoya normalde, ji bo deh mehan derbasdare ew jî heta ku daxwaziya we bê lêniherîn;
- di pêvajoya lêzgînde, ji bo deh şeş derbasdare ew jî heta ku daxwaziya we bê lêniherîn;

Walîtî tenê dikare belgeya we ya serlêdana penaberiye di rewşên jêrîn de red bike û nede:

- piştî red kirina daxwaza we ya berê, ku we ji nûv de serlêdana di berçav derbas kirina daxwza xwe kiri be (li 3.4.binhêrin) ;
- Ku biryarek dawîn a ji bo radest kirina we ji hela welatekî din ku ji bo welatê we hebe, an biryara girtin û teslîmkirina we li Ewropayê hebe, an daxwazek ji bo radestkirina we ji aliyê dadgehek cezayê a navnetewî hebe.

Piştî şandina belgeya we di nava 21 rojan de (8 roj ji bo dosya ji nûv de di berçavan derbas kirinê ye li beşa 3.3 û 3.4 binhêrin), divê hûn forma serlêdana penaberiye, ya ku ji aliyê walîtî ye ji were hatiye dayin hûn ji OFPRA yê re bişînin (li beşa 3.1 "lêniherîna ji aliyê OFPRA" yê binhêrin). Ger dosya ku we şandiye tamam be, wê OFPRA ji were ji bo wergirtin û qebûl kirina dosya we çêbuye wê name kê bişîni.

Ji bo ku hûn karibin belgeya xwe ya a serlêdana penaberiye ku we wergirtibû bugherînin, divê hûn herin walîtî ya herema ku hûn lê dimînin. Di her du pêvajoyade, çî normal û çî bi lezgîn, wê belgeya we ji bo şeş mehan nûve bibe û bê dirêj kirin.

Ji bo her serlêdana nû kirina belgeya xwe, divê hûn tevî hin belgeyên ku ji hela walîtî ye tîn xwestin radest bikin, tevî navnîşana ku hûn lê dimînin. Ji bo piştrast kirina serî lê dana we ya CNDA yê, divê ku hûn belgeya agahdariya wergirtina îtirazê xwe pêşkêş bikin (li beşa 3.2 "lêniherîna Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA)" binhêrin).

Hûn çawa karin navnîşana xwe piştrast bikin?

Ji bo serlêderên penaber ên qeyd kirina xwe ji 1 çilê ya 2019 -an û virde kirinin, hûn dikarin navnîşanê xwe li gorî şewayên jêrîn bidin isbat kirin:

- ger hûn li navendek pêşwaziyê ku ji bo serlêderên penaber, an di nava avahiyên din ên ku ji bo serlêderên penaber hûn dimînin (ji dervî mayina otêlan), bi belgeya ku ji aliyê îdara ku hûn girêdayinin ji were hatiye dayin;
- ger ku hûn li xaniyê xwe yê taybet an li xaniyek bi kirê an jî di apartmanek ku, ji aliyê pîreka we/zarokê we/nasê xwe/ku we li mala xwe bi cîh kiribin hûn dimînin, divê hûn vê navnîşana xwe bi belge yek ê piştrast bikin;





- di rewşên wekî din, bi vê armancê girêdayî divê hûn cîhe kî ji van navêndên pêşwazî kirinê bigirin û ji vê derê belgeya ji bo we pêwîste bi dest bixin (li beşa 2.1 binhêrin).

Ji bo serlêderên penaber, ên ku beriya 1 ê Çile ya 2019-an de hatine qeyd kirin, ku pêwîstî hebe dikarin li gorî ku li jor hatiye diyar kirin bimînin, û di karin wek berê jî jîyana xwe bidomînin.

Ev nû kirina vê belgeya serlêdana penaberiye heya ku mafê we yê li ser vê axa hebe tê dayin. Li gor prensîb, di tevahiya dirêjîya serlêdana we ya penaberiye û heta ku bi dawî bi be ev mafê we heye, bi dawî hatina vî mafî jî, li ser agahdariya biryara OFPRA yê, an jî di rewşa serlêdana CNDA yê li gorî ku pêwîst be xwendina biryarê li dadgehê bi awayek vekirî an ragihandina biryarê ji were tê kirin.

Dibe ku, belgeya we ya serlêdana penaberiye bê vekîşandin, an ji were ne yê nû kirin:

- ku OFPRA biryara serlêdanê we ne pejirand ev tê wateya dawîya hatina mafê we yê mayîna li ser vê axê ye (li beşa 5.1 "biryara red kirinê ji aliyê OFPRA an CNDA yê" binhêrin);
- dema ku serlêdana îtiraza we ji hêla CNDA yê ne hate pejirandin (li beşa 3.2 ya "lêniherîna Dadgeha Nişîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA)" binhêrin).

Baldarî: Bi belgeya serlêdana mafê penaberiye hûn ne karin li welatên din ên Yekîtiya Ewropîa yê bi awayek azad bigerin.

■ Ji bilî sedemên penaberiye ji ber hin derfetên din serlêdana rûniştinê.

Ger lêniherîna serlêdana we ya penaberiye dibin berpirsiyariya Fransayê de be, ji bilî mafê penaberiye hûn dikarin ji ber hin sedemên din serî li destûra rûniştandinê bidin.

Agahiyên zêdetir di belgaya ku di serlêdana we de, ku ji we re tê dayîn hûn ê peyda bikin, dem û mercên serlêdanê dinê ji were bi awayek vekirî têtê diyar kirin. Ku hûn vê dema hatiye diyarkirin derbas bikin, hûn ne karin ji vî mafê rûniştinê sûd werbigrin, ji bîli hin sedemên ku hatin piştras kirin.

2.2.2. Qonaxa duyemîn: nirxandin û yarmentiyên ji aliyê OFII yê tên dayin.

■ Pişgirtiyên we yê yarmentiyê li gorî pêwîstiyên we ên taybetî li gîşa yekemîn tê hesabandin.

Bi serlêdana we ya li gîşa yekemîn û piştî qeyd kirina serlêdana we ya penaberiye, hûn ê di heman demede li pêşingeha OFII yê, ji aliyê nûnerê wê dere werin pêşwazî kirin, ji bo yarmentiyên we yê şexsî û tewahî pêwîstiyên we ên taybetî wê bê nirxandin.

Ev hevpeyvîn wê bi awayek veşartî bê pêkanîn û niqaşên têkildarî sedemên serlêdana we ya penaberiye na yê kirin. Wê rêzîknamek ku ji pîrsa pêk tê ji we re bê pîrsîn, da ku mafê we ji şertên taybet ên pêşwaziyê sûd wergirtinê heye an tûneye. Ger ku rewşa we li gorî şertên ku tê xwestin be, wê nûnerê OFII yê wê hewl bide, da ku we li cîhe kî maqûl yê pêşwazî kirinê we bi de bi cîh kirin.

Bersiv dayina pîrsan li gorî daxwaza we ye, hûn di vî warî de azadin. Di rewşek ku red kirin ê de, ku xaniyek ne li gorî pêwîstiyên we be û hûn jê derkevin, di warê ragihandina agahiyên OFPRA yê diderbarê stauya we ku tê kirin ku hûn agahdar ne bin, rêveberî ne berpirsiyare.

Ger ku hûn bi dosyak bijîjkî hatibin Fransayê, wê nûnerê OFII yê dosya we bi awayek ewlehî bişîne cem bijîşkê OFII yê, da ku li gora biryara wî û rewşa we ji bo pêwîstiyên we li cîhê pêşwaziyê kirin ê bîn pêkanîn. Ger hûn nexweş bin, hûn ê werin derman kirin, an li navenda lêniherîna lezgin a li nexweşxaneya herî nêzîk de.





Ger ku nûnerê OFII yê rewşek bêhêz bûnê bibîne, ew dikari li ser daxwaza we agahiyê ji OFPRA yê re bişîne. Armanca vê agahiyê ewe ku pêwîst be, ji bo şertên daniştana we ya li OFPRA yê ku hûn ê herin hevdiştina ji bo serlêdana xwe ya penaberiyê bîn hêsan kirin (mînak, ji bo kesên seqet, çûn û hatina wan bi awayek hesan an peyda kirina tercumanek bi zimanê nîşanî). Pêwistiyên tê dîtin we ji aliyê OFPRA yê bê kirin.

Kesên ku rewşa wanî ewlehiyê dibin xeteri yê debi, di tevahiya dem dirêjaya prosedura serlêdana xwe ya penaberiyê de, dibin berpirsiyariya xebatkarên komel û navêndên pêşwazî kirinê denin, û divê xebatkar vê xalê her dem di berçavan derbas bikin û di pêvajoya îdarî û civakî de divê ji wan re bibin alîkar.

■ Alîkariyên tîn pêşniyar kirin.

Li gîşa yekemîn, alîkariyên ku wê ji we re bîn kirin yekser ji aliyê buroya OFII yê ji we re tê pêşkêş kirin, ku hûn van şertan pêktînin, ewê ev alîkariya van materyalên tîn pêşkêş kirin heta ku mafê we yê mayinê, wek penaberî kî li ser vê axê hebe wê bê dayin.

Ev belgeya pêşniyara ji hêla OFII yê di despêka wevdîtina yekemîn de ji were tê dayin, ev jî li gorî koma malbata wê, mafê we û materyalên ku pêwîste û li gora mercên di dema pêşwazî kirinê de tîn dayin. Ev belge ya ji hêla OFII yê ve nû hatiyê çap kirin, di dema ku pêvajoya wê didome ku zarokek xwedê da an jî ku zaroke kî we xwe nû gîhand we, divê ji bo yarmentî yên we, maf û mercên girtina materyala ku ji nû de bê hesabandin divê hûn wan agahdar bikin.

Wekî ku di beşa 4 ya vê rêbernamê de hatiye diyar kirin, şertên we yên wergirtina materyala wiha tê destnîşan kirin:

- ger we daxwaza cîhê mayinê kiribe, lêbelê heta bi niha hûn ne hatibin bi cîh kirin, ji bo dema pêş, hûn ê li ku derê werin bicîh kirin (li beşa 4.1 "Cîhê mayina serlêderên penaber" binhêrin);
- alîkariya ji bo serlêderên penaber, ji bilî li gora qanûnê hatiye diyar kirin, (li beşa 4.2 "Alîkariya ji bo serlêderên penaber (ADA)" binhêrin).

Di rewşek ku derfetên pêşwazî kirinê li herêma ku we serlêdan kiriye ne mabe, OFII dikare we bişîne heremek din, heta ku pêvajoya we ya serlêdanê bi dawî bi be, hûn ê li wê derê bi cîh bibin (Li beşa 4.1 "Cîhê mayina serlêderên penaber" binhêrin).

2.3. Piştî derbas bûna gîşa yekem rêhevaltiya ku wê bê kirin.

Piştî ku hûn biçin gîşa yekemîn û pêve, di derheqê cîhê rûniştinê de we ji re wê piştgirî bê pêşkêş kirin, ger ku ev cîh navendek pêşwazîkirina ji bo serlêderên penaber (CADA) an komelgehek lezgîn be (ne otêl) di demdirejahiya mayina we ya li vir de wê rêhevaltiyek ji were bê kirin.

Ger ku bi cîh bûna we ne li van navendan bi, piştgiriya we, wê ji hêla saziya pêşwazî kirina yekem (SPADA), a ku ji aliyê OFII yê ve ji we re tê pêşniyar kirin wê bê meşandin (li beşê 2.1 binhêrin).

Ev piştgirîya civakî, ji bo karên weyên qanûnî û îdarî di tevahiya mayina weya li vê derê tê kirin (li beşa 2.2.1 "Hûn çawa karin navnîşana xwe piştirast bikin?" binhêrin) ger ku Fransa ji serlêdana we ya penabeiyê berpirsiyar bê, ji bo amedekirina dosya wê ya serlêdana penaberiyê ya ku divê hûn ji OFPRA yê re ragihînin wê alîkarî bê kirin.

BALDARÎ: Ger hûn li SPADA de cîh digirin, divê ku hûn nameyên xwe bi awayek rêkûpêk bigrin, li gorî ku ji aliyê SPADA ji were hatî destnîşankirin.





3. Şertên lêniherîna serlêdaniya penaberiye

Gava ku lêniherîna dosya wê dikevi bin berpirsiyariya Fransayê, serlêdana we ji hêla dezgehek parastinê ve tete lêkolîn kirin, Buroya parastina penaberan û kesên bê hemwelati ya fransayê û ev jî dibin kontrola Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan tê kirin.

3.1. Lêniherîna ji aliyê Buroya parastina penaberan û kesên bê hemwelati ya fransa yê (OFPRA).

Roja yekem ku qeydkirina serlêdana we ya penaberiye ji aliyê walîtiyê tê kirin, ji we re formek serlêdaniya penaberiye tê dayin, da ku hûn veya tijî bikin û bişînin ji OFPRA yê re, ji bo ku ev daxwaza we bê lêkolîn kirin û biryarêk ê di derbarî wede bistîne.

Ku biryara neyînî ji hêla OFPRA yê bê dayin, ev di be mijara doza xwe birina pêşiya CNDA yê ye (li beşa 3.2 "Lêniherîna Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA)" binhêrin).

Dema ku hûn serlêdana xwe ya penaberiya dikin, ne hewce ku hûn cûreyên parastina ku hûn dixwazin diyar bikin (statûya penaberiye an jî parastina duyemîn). Di pêvejoya serlêdaniya we ya penaberiye qonaxa herî girîng, biryara daxwaza we ya serlêdaniya penaberiye ji hêla OFPRA yê ve bê lêkolîn kirine, wê pêşî li gora rewşa penaberiye bê dest girtin û paşre ku rewşa we ne girêdayî şertên penaberiye be, wê li gora parastina duyemîn bê lêniherîn.

■ Dagirtina forma OFPRA yê.

Ev forma divê bi zimanê firansî bê nivîsandin, bê îmzekirin û li gel foto kopiya belga serlêdana we ya penaberiye, du wenyên ji bo nasnamê û belgeyên we yê rêwîtiye ku di destê we de hebi tê dagirtin kirin.

Ger ku serlêdana we ya penaberiye di bin pêvajoya lezgîn de hatî pêkanîn, divê hûn kopiyek belga agahdariyê ku di dema qeyd kirina serlêdanê de ji we re hatî dayin bişînin.

Ji bo ku serlêdana we ji hêla OFPRA yê ve bê qeyd kirin pêwîstiya we bi van belgeyan heye.

Ger ku zarokên we yê piçûk di nava xeteriya kesane debin, divê hûn di forma serlêdana xwe ya penaberiye de bidin destnîşan kirin. Ger dê û bav her du jî, serlêdana penaberiye kiribin, wê zarokên piçûk li ser forma dê werin qeyd kirin.

Agahdariyên ku di serlêdana we ya penaberiye tê dayin, di bin ewlehiyê de ne û di tu rewşan de bi rayedarên welatê we re nayê parve kirin.

■ Şandina dosyê ji OFPRA yê re.

Ku dosya we bi tevahî hate tijekirin, **divê hûn bişînin, li gora prosedura normal herî dereng di nava 21-rojan da** (8-roj di derheqê daxwaza ji nûve vekirinê de - li beşa 3.3 an ku mafê we yê vekirina doza penaberiye hatibe girtin - li beşa 3.4 binhêrin) ji bo ku hûn karibin belgeya serlêdana penaberiye bi dest bixin.





Divê hûn tenê bi rê ka postaxanê bişînin, vê navnîşana jêrîn:

OFPPRA
201, rue Carnot
94 136 FONTENAY-SOUS-BOIS CEDEX

Mînak, heke ku belgeya serlêdana we ya penaberiyê di 10-ê Çile de hati be dayin, divê hûn dosya xwe ji OFPPRA yê re herî dereng di 31-ê Çile de bişînin. Dîroka ku mohra postê li ser hatiyê xistin, tê esas girtin.

Ev bi tundî tê pêşniyar kirin ku dosya xwe bi "nameya pejirandina wergirtinê û qeyd kirî" bişînin, navê xwe li beşa "ji aliyê kê ve" hatiye şandin binivîsin.

Ger dosya we ne temam be, wê OFPPRA ji we re baş de bişîne û 8 rojên din ji were tê dayin da ku hûn dosya xwe temam bikin û ji nû de bişînin (4 roj ji bo kesên ku daxwaza ji nû de an ku carekê din serlêdana wan di berçavare tê derbaskirin). Ger hûn di vê demê de de dosya xwe ji OFPPRA yê re venegerin, mafê we yê serlêdanê tê qedandin, bi vê re girêdeyi mafê we yê mayîne li vê qadê bi dawî dibe û serlêdana we ya penaberiyê ji nûve nayê kirin.

Hûn dikarin di dema pêvajoyê ku dosya we tê lêkolîn kirin, hûn belgeyên xwe yê nû ku wê bi dest xistiye bi rê ka postê ji OFPPRA yê re bişînin. Hema kopiyên name yê nû ku hûn ji OFPPRA yê re dişînin, belgeyên ku we girtiye û kaxizên ku we bi rêka postê şandiyê û ji aliyê wan hatiye wergirtin nîşan dide li gel xwe bigrin û bi parêzin. Her nameya ku hûn ji OFPPRA yê re dişînin divê hûn hejmara dosya xwe ya ku li ser nameya danasîna serlêdana we ya penaberiyê ku ji hêla ofîsê ji we re hatî şandin li ser binivîsin û vey a ji bîr nekin.

Ku di vê pêvajoyê de we navnîşana xwe guhert?

Ger we ji OFPPRA yê re navnîşanek têkildarî cihê rûniştinê dabi, ji navnîşana xweya rûniştinê cûda, û ku we cihê rûniştina xwe guhert, divê ku hûn zûtirîn OFPPRA yê agahdar bikin û hûn dikarin bi riya servîsê li hûn dikarin li ser malpera OFPPRA peyda bikin (www.ofpra.gouv.fr), sernav "Karûbarên li ser nettê". Navnîşana ku herî dawî ji aliyê OFPPRA yê de hatiyê naskirin tê esas girtin ev jî, ji bo şandina nameyên we gelek girînge, ji ber ku şandina vexwendina hevpeyvînê an biryara ku wê ji bo serlêdana we ya penaberiyê wê li ser vê navnîşanê bê şandin.

Ger ku hûn li xaniyê xwe yê teybet an li xaniyek bi kirê an jî di apartmanek ku ji/aliyê pîreka we/zarokê we/nasê we ku we li mala xwe bi cih kiribin, divê hûn ev navnîşana xwe ji OFII yê re bişînin.

■ Delîlên nasandina serlêdanê we ji hêla OFPPRA yê ve.


Dem a ku we dosya xwe bi awayek temam û di wextê de gihand OFPPRA yê, wê di derheqê serlêdana we de name yek nivîskî ku û hejmara qeyda dosya we ya serlêdana penaberiyê li sere, wê ji we re bê şandin. Bi vê belgeyê OFPPRA ji we re dide destnîşan kirin ku bi awayek fermî serlêdana we ya penaberiyê hatiye qeyd kirin.

Bi vê belge hûn dikarin belgeya xwe ya serlêdana yekem a penaberiyê nû bikin (li beşên 2.2.1 "Dayîna belgeya serlêdana mafê penaberiyê" binhêrin).

Bi gelemperî, agahdariya hevpeyvînê jî bi vê nameya danasînê ji we re tê şandin. Ev dîroka vexwendina hevpeyvînê jî li pişt a nameya danasînê tê destnîşan kirin. Ger ku ev vexwendin li pişt a nameya we ya danasînê xuya nake, wê paşê re bi name yek cuda wê ji we re bê şandin.

■ Lêniherîna serlêdanê di nava pêvajoya normal an pêvajoya lezgîn.





Serlêdana we ya penaberiye ji aliyê OFPRA ye ve, an dibin pêvajoya normal an dibin pêvajoya lezgîn tête lêkolîn kirin.

Wekî ku di beşa 2.2.1 de hatiye diyar kirin (sernav "Berbijarî ya serlêdana we ya penaberiye"), di pêvajoya lezgînde, prensîpê sînorenê lêniherînê 15 roj ji pêvajoya normale kêmtire, lê garantiya wan herdu ya jî eyneyê û hûn ji heman mafan sûd werdigrin. Dema ku pêvajoya serlêdana we ya penaberiye ji hêla OFPRA ye ve tê kevi nava pêvejoya lezgîn, ji ber sedemên ku qeydkirina serlêdana we ya penaberiye li gîşa yekeme. OFPRA dikari ku piştî dosya wê girti û pêve serlêdana we derbasî pêvajoya normal bike, ev jî li gorî rewşa dosya we an rewşa weya taybet tê nixandî, ger ku hebûna weya li ser vê axê tû xeteriyekê nedê ewlehiya gelemperî an ewlehiya dewletê tehdit neke.

OFPRA dikari li gorî rewşên jêrîn biryara pêvejoya lezgîn bide:

- ku we belgeyên sexte dabîn, ji bo xapandina OFPRA ye we agahdarî an belgeyên xelet an ku rastiya we veşartî dabîn;
- ger ku di bin nasnameyên cûda, cûda we serlêdana penaberiye kiribe;
- ku agahiyên we danin piştgirîya doza penaberiye nakin û ev pirsgrîkên we tû girêdana wan bi pêwîstiya parastinê tûne bi;
- ku gotinên we ne rast bin, nakokî di nav de hebin, bi awayek eşkere derew bin û li hember tiştên ku ofis li ser welatê we dizanin hûn ne rast bi axivin.

Ger hûn dixwazin li hemberî vê pêvajoya lezgîn nerazî bûna xwe bidin diyar kirin, hûn tenê dikarin di dema pêvejoya îtiraz kirina li pêşberî CNDA ye de hû dikarin vê nerazî bûna xwe bikin.

■ Hevpeyvîna kesane li OFPRA ye.

Piştî ku we serlêdana xwe ji OFPRA ye re şand, hûn ê vexwendinek hevpeyvînê bigrin.

Hûn tenê di du rewşande ji vê vexwandina hevpeyvînê bêpar dibin:

- gava ku agahdariyên ku we di dosya xwe ya serlêdaniyê şandiye OFPRA ye û ku agahiyên we li gora statûya penaberî bes be;
- gava ku ji ber sedemên tenduristî, ên gran û ku ji derveyî kontrola we, ku hûn nikaribin herî û nikaribin beşdarî hevpeyvînê bibin.

Ger hûn ji bo vexwendina hevpeyvînek bê nêzîkî kirin, divê hûn biçin buroya OFPRA ye, ku li Fontenay-sous-Bois ye. Hûn ê ji aliyê nûnerê OFPRA ye bê guhdarkirin, jê re di bêjin "nûnerê ofîsê" ku pêwîstiya we bi kesêkî ji bo wergerê hebi wê OFPRA ji were kesêkî psipor amade bike ev jî li gora zimanê ku we li gîşa yekem a serlêdana xwe ya penaberiye kiribu tê amade kirin (li sernava 2.2.1 "helbijartina zimanê axaftinê li OFPRA ye" binhêrin). Lêbelê, hûn dikarin her gav daxwaza ku bi fransî jî bê guhdarkirin bikin. Hûn tenê dikarin îtiraza vî zimanê di hevpeyvînê de hatiye bikar anîn, li pêşiya CNDA ye bikin.

Ger ku hûn beşdarî vê hevpeyvînê nebin, ev ne bûna we dibe sedem ku OFPRA li ser dosya we biryarê bide an jî ev biryar bibe sedema dawî anîna serlêdana we. Ji ber vê yekê pêwîste ku, di rewşek astengiyê de ku hûn ne karibin beşdarî vê vexwandanê bibin, divê herî kêm di nava 48 saetande hûn OFPRA ye agahdar bikin, an jî bi avayek fermî name yekê, ji navnîşana ku li ser belge vexwendana we hatiye destnîşan kirin re bişînin.

Ger hûn bixwazin, di wexta hevpeyvînê de, parêzerek an nûnerê komele yekê ku ji hêla OFPRA ve hatiye qebl kirin, ku ji bo di dawîya hevpeyvînê de karibi çavdêriyên xwe bikin dikarin amade bibin. Ger ku parêzer an nûnerê komeleyê di wexta vê hevpeyvînê de ne amade be, ev hevpeyvîn nayê paşve xistin. Ger seqetiyek we hebe, hûn dikarin daxwaza, di dema hevpeyvînê de ji hêla pisporê tenduristiyê ye ku rewşa we bi giştî di şopîni an nûnerê komelên ku bi kesên seqet re alîkar dibin amade bin.

Ger hûn bixwazin, ji ber hin sedemên diwariya ku li we hatiye kirin, hûn dikarin beriya vê hevpeyvîna daxwaza kesên ku wê tekevin vê hevpeyvînê bi taybetî ku we şideta cinsî an dest dirêjayiyên cinsî li we hatibi kirin bi vê re girêdayî, hûn dikarin cinsiyeta wan ji OFPRA ye daxwaz bikin bi taybetî ji bo nûner û/an kesê ku wê wergerê bike.





Hevpeyvîn dibin ewlehiyede. Gotinên we, wê ji hêla nûnerê ku hevpeyvîna we pêk anîye û li gel îfadeya weya nivîskî ku we şandi bû wê bibê raporek, ger hûn daxwaz bikin wê beriya biryarê ji we re bê ragihandin (di pêvajoya normal de) an herî dereng li gel biryara we (an di pêvajoya lezgîn de).

Hevpeyvîna wê bi awayê dengê jî tê qeydkirin ku di rewşek biryarek neyînî ji hêla OFPRA yê ji wer hat hûn dikarin serî li dijî vê biryarê bidin û bigihîjin vê qeyda deng.

Hûn dikarin ji dervî navenda OFPRA yê ku li Fontenay-sous-Bois yê bîn guhdarkirin?

Hevpeyvîna we dibe ku ji ber durbûna erdnîgariyê (bi taybetî gava ku hûn li derveyî deryayî bin) an rewşa we ya taybetî (gava, ji ber sedemên tenduristî an malbatî, kû hûn ne karîr rêwîtiyê bikin an heke hûn li cîhekî azadiya we ji destê we de hatibe girtin), ev hevdiîn li Fontenay-sous-Bois çênabe, lê bi şewayek ragihandinê hûn ê bîn guhdarkirin.

Di vê rewşek wiha de, parêzer an nûnerê komeleyê ku we xwestiye, wê li gel we bin. Kesê ku wergerê dike wê li kêleka nûnerê parastinê be.

Gava ku hûn derveyî deryayî bin an li hin metropole kî herêmêk dûr û ji derve bin, hûn dikarin dîrek ji aliyê nûnerê OFPRA yê vê bîn guhdarkirin, Heke hûn di herema Gûyana, an Cayyene an li navenda weya wê derê an jî li herêmên din ên grêdayi vê axa bin, ev jî dibin mîsyona OFPRA yê ku girtiye serxwe de ye û hûn ê ji aliyê wê ve bîn guhdarkirin.

■ Lêniherînên bijîjkî.

OFPRA dikare muayeneyek bijîşkî ji we daxwaz bike. Ku hûn daxwaza vê muayeneya bijîjkî red bikin nabi sedema OFPRA di derheqê doza wede biryarek neyînî bide û li pêşiya biryare nabe asteng. Ger hûn piçûk bin û serlêdana we ya mafê penaberiyê li ser navê we hatibi kirin û ev jî ji ber sedema xeteriya sunetkirina keçikan hatibe kirin, çûndinê vê muayeneya bijîşkî ji hêla OFPRA ve tê dayîn. Doktor vê belgeya bijîşkî rasterast ji OFPRA yê re dişîne, û ewê yek belgeyê jî teslîmî dê û bavên we an kesê ku berpirsiyariya we bi fermi girtiye serxwe bike.

■ Biryara OFPRA yê.

✓ Dem direjahiya wê

Dem direjahiya bersiv dayina biryara OFPRA yê tê guhertin: Ji bo pêvajoya lezgîn bi kêmanî 15 roj û ji bo pêvajoya normal heta çend mehan didome. Bêdengî û dirêj kirina OFPRA yê na yê wateya ku daxwaza we hatiye red kirin. Ger ku OFPRA di nav 6 mehan de biryarekê ne de ewê, we bi nameyekê agahdar bike. Ji ber vê jî divê hûn ji nameyên xwe hîşyarbin.

✓ Biryara erenî (li beşa 1 "Şêwen cûda yên parastinê" binhêrin)

Ger ku daxwaza we bi biryarek erenî hatibi pejrandin, hûn ê:

- **Ku wekî penaber bê nas kirin**, wê OFPRA ji we re biryara di derbarê rewşa we ya penaberiyê bişîne;
- **an jî ku we mafê parastina duyemîn sitend**, wê OFPRA vê biryarê bi name yekê ji were bişîne, ku hûn bikaribin li pêşberî rayedaran bidin destnîşan kirin ku hûn ji mafê parastinê sud werdigirin.

✓ Biryara neyînî

OFPRA dikare di derbarê serlêdana we ya penaberiyê de sê biryarên cûda ên negatîf bide:

- **biryara red kirinê;**





Hûn dikarin vê biryarê li pêşiya CNDA yê îtiraz bikin. Tekîldarê mafê we yê mayîna li ser vê axê, di bin navê penaberiye de, di sernava "Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê" tê destnîşankirin li beşa 3.1 binhêrin.

- **biryara neyenî** ji ber hin sedeman tê dayin:
 - ku we berê mafê parastina penaberiye li yek ji dewletên endamên Yekîtiya Ewrûpayê girtibe;
 - ku li welatekî sêyemîn statûya penaberiye an parastinek bi bandor ji bo we hatibi dayin, an jî hûn di karin mafê rûniştandina xwe ji nû de dirêj bikin.

Hûn dikarin vê biryarê li pêşiya CNDA yê îtiraz bikin. Di rewşek wihade mafê we yê mayîna li ser vê axê wek penaberekî xelas dibe, di hin rewşan de ku we li CNDA yê îtiraz jî kiribe (li beşa 3.1 "Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê" binhêrin).

- **biryara qefaltinê** ji ber hin sedeman tê dayin:
 - ku we ji OFPRA yê daxwza paşde vekişandina serlêdaniya xwe ya penaberiye di hevpeyvînê de an jî bi name yekê kiribi;
 - ku we di nav 21 rojan da serlêdana xwe nekirbe an jî hûn beşdarî hevpeyvînê ne bûne;
 - ku hûn bi zane bûn agahdariyên bingehîn ên ji bo lêniherîna serlêdana xwe nadin;
 - ku we navnîşana xwe di hundurê demek maqûl de neşandiye û ew nikaribin bu we re tekîliyê dînin.
 - ku we serlêdana xwe li gîşên yekemîn qeyd kiriye, lê ji ber sedemek ne girîng, we dosya xwe ji OFPRA yê re ne şandi be.

Hûn dikarin vê biryarê, ne li pêşiya CNDA, lê belê li pêşiya dadgeha îdarî îtiraz bikin. Di rewşek wihade mafê we yê mayîna li ser vê axê wek penaberekî na mîne (li beşa 3.1 "Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê" binhêrin). Hûn dikarin, piştî biryara girtina dosya we û pêve di nava 9 mehan de îtiraza vê biryara qefaltinê bikin û daxwaza ji nûve dosya we bê vekirine bikin (li beşa 3.3 binhêrin).

✓ **Rêbazên şandina biryara OFPRA yê**

OFPRA we biryara red kirina serlêdana we bi belge yek nivîskî ji we re bişîne, bi zimanê fransî û zimanê ku hûn têdighêjin, ev tê wateya ku biryara we ya serlêdanê hatiye red kirin ku nîşanî we dide.

Ma OFPRA dikare nameya weya pejirandina serlêdana weya penaberiye, vexwendina weya hevpeyvînek kesane û biryara we bi rêka elektronîk ve ji we re bişîne?

OFPRA bi pergala ku pêşxistiye armanc dike ku, ew ê nameyên di derbarê peşxistina daxwaznameya weya serlêdana penaberiye û pejirandina wê, vexwendina weya hevpeyvînek kesane û biryara ku di derheqê we de hatiye dayin, bi rêka elektronîk ve wê ji we re bişîne. Rewşa nebenîtiyê û ewlehiyê wê di tevahî ya pêvajoya serlêdana weya penaberiye de, tê misoger kirin.

Dema ku hûn têkevin nava vê pergalê, û wexta ku hûn serlêdana xwe ya penaberiye qeyd bikin an jî ku vegera we a ji bo Fransayê çêbû, û ku ew berpirsiyarê serlêdana weya penaberiye bê, an jî ku hûn dinava prosedûra "Dublin" de bin hûn ê agahdar kirin, ên ku dinava xala 2.2.1 de hatî destnîşankirin, jê feyde nagri. Paştre ji bo pêkanîna vê pergalê hûn ê zêdetirîn bîr agahdar kirin.

■ **Li dijî biryara OFPRA yê îtiraz kirin.**

Hûn dikarin vê biryara OFPRA yê piştî ku biryar giha destê we û pêva di nava mehe kê de li pêşiya CNDA yê îtiraz bikin (li beşa 3.2 "Lêniherîna Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA)" binhêrin). Ger we di nava mehe kê de daxwza îtiraza vî biryarî ji CNDA yê re ne şandi be, mafê we yê mayîna li ser vê





axê na mîne, destura mayina we ya li vir bi belgeya we ya serlêdana penaberiyê vê giêdayi yê, ku ev bê vekîşandin an ne yê nû kirin û divê hûn ji Fransayê derbikevin.

Ger ku hûn bixwazin îtîraza xwe li pêşiya CNDA yê bikin û hûn bixwazin ji alîkariya hiqûqî sûd werbigirin, divê ku hûn ê di nava 15 rojan de piştî agahdarkirina we ya ji biryara OFPRA yê vê daxwazê pêk bînin. Dema we ya serlêdanê yek mehe divê ji bo girtina alîkariyê û tevahiya karên îtîrazkirina wê demek gelek kin di mîne ev li gora dîroka ku biryar ketiyê destê we tê hesabandin (li beşa 3.2 "Piştigiriya parêzerekî" binhêrin).

Biryara CNDA yê di kari ji bo we û ji bo OFPRA yê jî bive mijara çûyina li pêşiya Konseya Dewletê.

■ Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê.

Li gorî prensîb, di tevahiya demdirêjiya lêniherîna serlêdana we ya penaberiyê, lêniherîna hiqûqî ji di nav de mafê we yê mayina li vê derê heye.

Lêbelê mafê we yê mayinê kengî bi dawî dibe, dema ku hûn tê kevin yek ji nav mijarê jêrîn yên biryarên OFPRA yê:

1. biryara negatîf dibe ji ber sedema ku we li dewletek din parastinek bi bandor girtibe, ger ku ew Dewlet ne endamê YE be, dikarin wê bişînin (li beşa 3.3 binhêrin);
2. biryara girtinê (li beşa 3.3 binhêrin);
3. dibe biryarek red kirinê di derbarê serlêdana we ya penaberiyê hatibe dayin ku pêvejoya lêniherîna dosya we di nava pêvajoya lezgîn de bû, ev jî ji ber sedema ku hûn ji welatekî ewlehî hatinin;
4. dibe biryarek red kirinê di derbarê serlêdana we ya penaberiyê hatibe dayin ku, pêvejoya lêniherîna dosya we di nava pêvajoya lezgîn hatiye bicîh kirin, ji ber ku hebûna we li ser axa netewî ji bo ewlehiya giştî xeterek ciddî tê dîtin;
5. dibe biryarek red kirinê li ser daxwaza ji nû de lêniherîna dosya xwe ku we kiri bû ev ne hatibe pejirandin;
6. biryareke neyenî li ser yekemîn daxwaza ji nû ve lêniherîne hatibi dayin;
7. Ku biryara dersînorkirinê ji were hatibe dayin, qedexa yek we ku hûn ne karibin li ser vê axê bimînin û ev biryar ji hêla rêveberiya îdarî an ji hêla dadwer ve hatibi destnîşan kirin (li beşa "Ku biryara dersînorkirinê ji we re hatibe dayin, qadexa mayinê we li ser vê axê hebe û ev biryar ji hêla rêveberî an dadgeha îdarî ve hatibi destnîşan kirin?" di nava beşa 2.2.1 binhêrin).

Di van rewşan de, dibe ku belgeya we ya serlêdana penaberiyê paşve were xistin an jî ne yê nûve kirin û dibe ku hûn ji nava axa Fransayê bîn dersînorkirin (li beşa 5 binhêrin).

3.2. Lêniherîna Dadgeha Niştîmanî ya Mafên Penaberan (CNDA)

■ Dem direhêjiya serlêdanê.

Piştî biryara neyenî ya OFPRA yê, di nava mehe kê de divê hûn serlêdana xwe ji CNDA yê re pêşkêş bikin. Hûn dikarin:

- di rewşa ku OFPRA biryara negatîf an red kirinê da, ji bo betal kirina vê biryarê bi awayek fermî bidin û daxwaza parasitinê ji dadgehê bikin;
- di rewşê ku OFPRA biryara parastina duyemîn ji we re da bijî, ku hûn bixwazin, daxwaza parasitina penaberiyê bikin. Di vê rewşê de jî, hûn ê sûd ê ji parastina duyemîn bigrin û hûn ê mafê parastinê û mayina li vir bigrin (li beşa 6-ê "Sûd wergirtina ji mafê parastinê" binhêrin), ku statuya we ya penaberiyê ji aliyê CNDA yê ve hîn ne hatibe naskirin jî. Wekî din, ku CNDA statuya





we ya penaberiyê nas neke, ew nikare parastina duyemîn ku berê ji aliyê OFPRA vê we bidest xistiye bi paş ve bikişîne.

Divê ku hûn vê îtirazê di nava mehe kê de li pêşiya CNDA yê bikin (mînak, ku we biryara red kirina xwe ji postê di 20-ê Çile girt, divê îtiraza we herî zêde di 21-ê Sibate ji aliyê CNDA yê ve we re wergirtin). Divê îtiraz we ya li pêşiya CNDA bi name yek qeyd kirî û wergirtinê hatibi pejirandin, an jî bi nameya hêsan an bi faks ve bê şandin. Ji ber vê yekê divê, beriya ku mehek we bi dawî bibe hûn ê ev nama îtiraza xwe bişînin, ku hûn bi rêka fax-ê jî bişînin divê beriya dema we ya mehek ê bi dawî bibe herî dereng roja dawîn û deqqeyên dawîn bê şandin. Ger we dinava mehek ê de serî lê ne da, hûn bi ti cûreyî ne ma dikarin îtiraza xwe bikin, ew tê wateya ku pê lêniherîn û pêyî ku hûn derkevin pêşiya dadgehê wê hûkmê red kirin ê bê dayin.

■ Piştgiyariya parêzerekî.

Ji bo rûniştina li CNDA yê hûn dikarin Parêzerekî ji bo alîkariya xwe daxwaz bikin ev mafê we ye. Ji bo vê yekê hûn dikarin serlêdana alîkariya hiqûqî bikin. Tevahiye çûndinên parêzer ji hêla Dewletê ve tê dayîn û mafê parêzer tûneyî ku ji we daxwaza peran bike.

Ji bo serlêdana vê alîkariya hiqûqî, divê hûn piştî biryara OFPRA yê giha destê we û pêve di nav 15 rojan da serî li buroya alîkariyên hiqûqî bidin ku daxwaza vê alîkariya tekîldarî îtraza biryarê li pêşiya CNDA yê ye.

Navnîşa Buroya Alîkariya Hiqûqî ya CNDA (BAJ):

Cour nationale du droit d'asile
35, rue Cuvier
93 558 MONTREUIL-SOUS-BOIS

Hûn dikarin navê parêzerê ku ji bo parastina we ya li ser alîkariya hiqûqî ku we li hevkiyê ji CNDA yê re destnîşan bikin. Ger ku hûn ji alîkariyek hiqûqî sûd werdigirin, û parêzerê ji bo we hatiye dayin ne hewce ye ku hûn pera bidin parêzer, heke ew ji we daxwaza bike jî divê hûn ne dinê.

Ev alîkariya hiqûqî dibe bê rêd kirin ew jî ku daxwaza serlêdana we ya îtirazê ne yê qebûl kirin dibe ev alîkarî bê red kirin.

Hûn dikarin daxwaza serlêdana alîkariya hiqûqî di nav 15 rojan de bikin, kû hûn karibin serlêdana îtiraza xwe li pêşiya CNDA yê bikin tenê ku ev serlêdan divê demêde hatibi kirin ev biryar tê rawestandin. Ew jî ku buroya alîkariya hiqûqî ku di derbarê daxwaza serlêdana we ya alîkariyê bi nama yek ê agahdar kiribe tê dest pê kirin. Hûn tene dikarin di nava mehek ê de serî li CNDA yê bidin, ji bo vêjî divê piştî biryara OFPRA yê giha destê we û dîroka ku we ev biryar girtiyê destnîşan dike, divê hûn bi parêzin da ku hûn bi karibin alîkariya hiqûqî û serlêdana îtirazê xwe bikin.

Mînak, heke OFPRA di 15-ê Çile de we ji biryara red kirinê agahdar kiribe , divê hûn dinava 15-ê rojan de serlêdana alîkariya hiqûqî bikin. Ger ku hûn di 20-ê Çile de serî li alîkariya hiqûqî bidin, ku piştî ragihandina biryara OFPRA yê bi 5 rojan, ji bo biryara daxwaza we ya alîkariya hiqûqî 26 rojan bi hesabînin ku, buroya alîkariya hiqûqî biryara serlêdana we bike.

■ Îtiraz kirin.

Divê ji şertên jêrîn re rêz bê dayin:

- yekem tişt, divê hûn hemî şiroveyên ku sedemên red kirina OFPRA yê ku li piştî belgeya biryara red kirinê hatiye diyar kirin baş bixwînin;





- îtiraza we divê bi fransî li ser kaxezekê normal bê nivîsandin (formatek taybetî ji bo vê tûne ye) divê ku hûn paş navê xwe li ser destnîşan bikin, navê we yî yekem, dîrok û cîhê ji dayik bûnê, hemwelatî û navnîşana xwe tê de bidin destnîşan kirin.
- divê ku hûn îtiraza xwe îmze bikin; ger ku hûn piçûk bin, divê nûnerê we yê fermî wê îmze bike;
- li gel vê îtiraza xwe divê hûn kopiyek biryara OFPRA yê ku ji we re şandiyê bişînin;
- ger ku serlêdana we ya penaberiyê dinava pêvajoya lezgin de be, divê hûn kopya agahdariyê ku di dema qeyd kirina serlêdana we ya penaberiyê hati bû kirin bişînin (li sernava "Berbijarî ya serlêdana we ya penaberiyê" beşa 2.2.1 binhêrin);
- divê hûn îtiraza xwe baş rawe bikin, ango diyar bikin ka hûn çima bi sedemên red kirinê OFPRA yê ne razîne an jî ji bo çî sedeman hûn îtirazî biryara OFPRA yê dikin, da ku hûn ji parastina duyemîn sûd ê werdigrin û ji bo çî biryara erenî ji bo serlêdana we ya penaberiyê ne hatiye dayin;
- divê hûn tevahî belgeyên ku nasname û netewa we piştrast dike divê hûn pêre bişînin;
- divê tevahî belgeyên girêdayî çîroka we û ku wê tamam dike divê hûn pêre bişînin;
- ger ku hûn dixwazin zimanê ku hûn li OFPRA yê hatine guhdarkirin bê guhertin, divê hûn di îtiraza xwe de destnîşan bikin û divê ku hûn zimanê dixwazin bêne guhdarkirin bidin diyar kirin. Ger ku dadgeh vê nakokiyê bibîne lêbelê ku ne karibe tercumanekî ji bo wergera zimanê we daxwaz kiriye peyda bike, ew dem hûn ê bi zimane ku hûn ê karibin çêtirîn fêhm dikin hûn ê bîn guhdar kirin.
- divê hûn tevahiya belgeyên xwe yê ji bo îtiraze we şandine kopîk ji wan li gel xwe bigirin;
- divê hûn CNDA yê ji tevahî guhartinên navnîşanên xwe agahdar bikin;
- piştî qeydkirina serlêdana we hûn dikarin di derbarê dosya xwe de daxwaza agihdariyê bikin.

Ji bo belgeyên ku hemwelatî bûna we piştrast dikin, tê pêşniyar kirin ku hûn kopiyê wan bi dosya xwere bişînin û esliya nasname û pesaporta xwe li gel xwe bihêlin. Ku ev belgeyana li gel we bin, hûn ê karibin name yê qeyd kirî ku ji aliyê CNDA yê bi rêka postê ji were tê şandin bigrin. Roja rûniştina dadgehê ku dadwer daxwaz bike hûn dikarin orîjînalê destnîşan bikin.

Ji bo ku ev belgana îfada we piştrast dikin, kû hûn orîjînalê wan bişînin divê hûn kopiyên van li gel xwe bihêlin. Heke hûn daxwaz bikin, ew dikarin van belgeyana di roja rûniştinê li we vegeznin, an jî dikarin paşre bi rêka postayê ve ji we re bişînin. Divê belgeyên ku îfada we piştrast dikin wergerînin Fransî. Ku wergera wan ne hatibi kirin, CNDA ne dikari wan bikarbîne. Lêbelê, ji bilî belgeyên girêdayî nasname, rewşa we ya medenî û belgeyên dadgeh an polîs, ne mecbûrî ye ku wergerandina vana, ji hêla wergerekî sond xwarî bê çêkirin.

Heke ku hûn ji bo rûniştinek giştî ji gel vekirî bîn gazîkirin, hûn dikarin agahdariyên zêde bi rêka nivîskî bişînin, heta dema dîroka ku li ser daxuyaniya we de tê destnîşan kirin.

■ Pejirandina wergirtina îtiraza.

Piştî qeyd kirina serlêdana îtiraza we li CNDA yê, wê belgeyek bi navê "pejirandina qebûl kirina îtirazê" ji we re bişînin navnîşana ku we destnîşan kiriye. Ev belge qeyd kirina îtiraza we piştrast dike.

Ji bilî îstîsnayan (li beşa jêrîn "Karakterên sekinandina îtirazê" binhêrin), ev belge destûrê dide ku hûn belgeya xwe ya serlêdaniya penaberiyê nû bikin û bivê destura statuya CNDA yê hûn ê karibin li Fransa bimînin.

■ Karakterên sekinandina îtirazê





Bi gelemperî, mafê we yê sekinanda biryara OFPRA yê li pêşiya CNDA yê îtiraz kirinê heye, û ev îtiraz bi awayek otomatîk biryarê dide sekinandin, ango ev tê wateyê ku hemû mafê we didome û mafê we yê mayinê ser axa Fransayê bivê girêdayîye, ev mafê we heya ku dadgeh biryara xwe ya di derbarê doza we de bide didome.

Heke ji aliyekî din ve, we mafê mayian li ser axa Fransayê wenda kiribe û ev berî ku biryara serlêdana we ya penaberiya hatibe kirin be (li beşa 3.1 "Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê" binhêrin) **mafê we heye ku hûn li pêşiya CNDA yê vê biryarê îtiraz bikin,** li dijî biryara red kirin an ne pejirandina OFPRA yê ev îtiraz otomatîk na yê betal kirin:

- ✓ ku rewşa we yek ji biryarên jêrîn be **îtiraza seknandina biryarê na be** û dibe kû hûn têkevin nava yek ji mijara biryarên jêrîn:
 1. biryara negatîf dibe ji ber sedema ku we li dewletek din parastinek bi bandor girtibe, ger ku ew Dewlet ne endamê YE be, dikarin wê bişînin (li beşa 3.3 binhêrin);
 2. biryara girtinê OFPRA yê (li beşa 3.3 binhêrin);
 3. piştî serlêdana we ya yekemîn biryara negatîf a OFPRA yê têne ji bo ku hûn mayina xwe ya li vir dirêj kirinê ku we ev daxwaza ji nû ve lêniherîne kiribe.
- ✓ **ev biryara seknandina îtirazê otomatîk çê na be, hûn dikarin ji bo seknandina vê biryare serî li dadgeha îdarî bidin, da kû vê biryarê bide seknandin û dema mayina wê bê direj kirin, ku serlêdana we ya pêşiya CNDA yê bê despêkirin,** dibe kû hûn têkevin nava yek ji mijara biryarên jêrîn:
 1. dibe biryarek red kirina OFPRA yê ji ber serlêdana we ya penaberiya keti bû nava pêvejoya lêniherîna lezgîn û ev jî ji ber ku hûn ji welatek ewlehî hatinin vir;
 2. dibe biryarek red kirina OFPRA yê ji ber serlêdana we ya penaberiya keti bû nava pêvejoya lêniherîna lezgîn û ji ber ku hebûna we li ser axa netewî ji bo ewlehiya giştî xeterek ciddî tê dîtin;
 3. biryarek red kirina OFPRA yê dibe ji bo ji nû de daxwaza lêniherîna dosya xwe kiribû ev ne hatibe pejirandin;
 4. piştî biryara negatîf a OFPRA yê we daxwaza serlêdana we ji nû ve bê lêniherîn kiribû û ev tenê ji bo sekinandina biryara derxistina we hatibe kirin;
 5. ku biryara dersînorkirinê di derbarê we de hatibe dayin, qedexe yek we ya ku li ser vê axê mayinê ji hêla rêveberiya îdarî an ji hêla dadwer ve hatî bi girtin (li beşa "Ku biryara dersînorkirinê ji we re hatibe dayin, qadexa mayinê we li ser vê axê hebe û ev biryar ji hêla rêveberî an dadgeha îdarî ve hatibi destnîşan kirin?" di nava beşa 2.2.1 binhêrin).

Hûn dikarin vê sekinandinê bixwazin, ango di çarçoweya îtiraza we ya dijî fermana derxistina we, ger ku biryara derxistina we, beriya qeyd kirina serlêdana we ya penaberiya divê hûn di vê mijarê de bi awayek fermî hati bin agahdar kirin, hûn ne karibin vî biryarê derxistinê bidin seknandin, dibe kû piştî vê biryarê dinava 48 seatên de di derheqê we de biyara binçavkirin an xistina kontirola li mala bê binçavkirin bê derxistin.

■ Rûniştina li CNDA yê.

CNDA vexwendina we ya rûniştinê dike da ku îtiraza we binirxîne. Ev agahi ya vexwendinê wê, herî kêr berî roja rûniştinê bi mehek ê ji we re bi name yekê bê şandin, heke serlêdana we di pêvajoya lezgîn de bi hûn ê beriya rûniştinê bi 15 rojan werin gazî kirin.

Lêbelê, eger îtiraza we ya li dijî biryara OFPRA yê ji aliyê CNDA yê ciddî neyê dîtin, piştî xwendina dosya we ya ji hêla raporvan dikare, beyî ku gaziyî weyî rûniştinê bikin îtiraza we bê red kirin.





Heke pêwîst be, li dadgehê rûniştin pêk tê:

- an li avahiyên CNDA yên, ku li Montreuil yê an jî li navnîşana Palais de Justice (Ile de la Cité) yê;
- an jî ev rûniştin bi rêka ragihandina vîdyoyê li nav avahiyên ku girêdayî wezaretê dadê pêk tê. Baweriya rûniştina li dadgehê û kalîteya ragihandina vîdyoyê tên garantî kirin.

✓ **Lêniherîna dadmendê:**

Lêniherîna dadmendê, piştî ku îtiraza we ji hela hakîm ê CNDA yê û ku tê nixandî û pêve tê birêvebirin. Ew kesayetiyek prsipore û ji hela Komîseriya Bilind a Penaberan (HCR) ve hatiye pejirandin û tayîn kirin. Lêniherîna dadmendê, piştî guhdarkirina îtiraza we ji hela raporterek kî, ku ev raporter analîza serlêdana we ya penaberiyê bi awayek bê alî ku li ser biryara ku wê bê girtin ti bandorî neke şîrove dike, piştî vê raporê dadwer guhdarî şîroveyên we û ku hebê yên parêzerê wê li ser îtirazkirina we ya vê biryare dike.

Gava ku buroya hikûmetê biryara prosedûra lezgin da, an gava ku ew fêhm kir ku ev daxwaza we nayê qebûl kirin, biryara serlêdana we ya îtirazê ji aliyê dadwer ê CNDA yê di nav pênc hefteyan de tê dayin.

Dadgeh di kari bi insiyatifa xwe an li ser daxwaza we, bi biryara yek girtî a hevkarê dadmendê, dikare lêniherîna pêvajoya lezgin ne di cîh bibine, bi de rakirin û ku wê ev biryar wê bibe sedema pirsgrêkên ciddî û ji ber vê jî ku nayê qebûl kirin bide.

✓ **Wergandin:**

CNDA ji bo ku hûn baş fehm bikin bi zimanê ku hûn di axivin û ku dema ku we qeyd kirina serlêdana xwe ya penaberiyê daxwaz kiri bu, bi wî zimanî ji we re tercumanê kî amade dike (li beşa "Helbijartina zimanê axaftinê li OFPRA yê" yê binhêrin) ku di rewşek ev ne mimkûn be, wê ji bo we bi zimanê kî din ê ku hûn di zanin wê tercumane kî amade bikin. Ger hûn ji wê wergera li pêşiya OFPRA yê ne razîbin û hûn dixwazin wê bugherînin, divê hûn di dema îtiraza xwe ya li pêşiya CNDA yê vê daxwaza xwe bidin desnîşan kirin. Di dema rûniştina we ya li dadgehê û ku bi şêwayê ragihandinê pêk tê, wê tercumanek li gel we amade bi da ku wergera we bike. Ger dîtina tercumane kî ku bi fizîkî li gel we amade bi be neyê dîtin, wê bi biryara dadgehê tercumane kî ku karîbi li rûniştina dadgehê amade ne bê, lê ku bi karîbe bi rêka telefonê wergera axwaftina we bike bê peydakirin.

✓ **Amade bûna we ya li rûniştina dadgehê:**

Agahdar kirina we ya ji bo amade bûna we ya li rûniştina dadgehê bi rêka name yek pejirandî tê kirin. Divê ku hûn CNDA yê ji dereng mayian xwe an astengiyên ku derketinî agahdar bikin. Ger hûn ne karîbin beşdarî rûniştinê bibin, hûn dikarin bi daxwaznameyek ê paşve bixin, divê ku hûn sedemên ne amade bûna xwe bi nivîskî bidin destnîşan kirin. Daxwaza paşve xistinê ne mafek e, tenê serokê dadmenda CNDA yê di kari biryara paşve xistina rûniştinê bi de û dîrokêk dinê ji bo rûniştina dadgehê bide.

✓ **Karakterê rûniştina giştî:**

Rûniştina bi awa yê giştî. Hûn dikarin ji serokê dadgehê daxwaza rûniştina girtî jî bê kirin bikin, ango li rûniştina dadgehê lêniherîna doza we ji gel re girtî bê meşandin. Di rewşek wihade bi awayek atomatîk ji giştî re tê girtin. Dive ku serokê dadgehê vê biryar bide.


■ **Biryara CNDA yê.**

Ku CNDA biryara xwe da, wê vê biryarê bi rêka "name yek pejirandî ku hatiye wergirtin û qeyd kirî" ji we re bişîne.

Ev biryar bi fransî ye, li gel belgeyek ku wateya biryarê bi zimanê ku hûn fam dikin ji we re tê şandin ev jî, ji ber sedema ku ew bawer dikin ku hûn bi vî zimanî baş fam dikin.

CNDA di nava biryara xwe de, dikare:





- biryara OFPRA yê betal bike û statuya penaberiye an parastina duyemîn bide we. Ev jî weke ku we her du mafên parastinê ji aliyê OFPRA yê girtibe, di nav bêra wan de tû cûdayî tûne ye û her du jî mîna hevin;
- biryara ji aliyê OFPRA yê ve hatiye dayin tê betal kirin û parastina duyemîn an statuya penaberî yê wê ji we re bê dayin;
- ku biryara red kirina OFPRA yê bê qebûl kirin û îtiraza wê bê red kirin;
- di hin rewşan de, ew di karin biryara OFPRA yê betal bikin û daxwaza serlêdana we ya penaberiye ji nû ve di berçawanre bê dersbas kirinê bikin.

biryara CNDA yê dibe bibe mijara îtiraza li pêşberî Konseya bilind a Dewletê. Ew li daxwaza we na neri, lê tenê ew li hin pirsên dadgerî dineri. Ev pêkanîn gelek dirêj e û pêwîstiya we bi parêzerek kî pispor heye. Di kari serî li alîkariya hiqûqî bê dayin. Ev îtiraza we mayîna we ya li Fransayê dirêj na ke û pêşî girtina şandina we ya ji bo welatê we nagiri. Ji bo agahiyên zêdetirîn yê di derbarê vê pêvajoyê de, baştirîn ewe ku hûn ji komeleyek an parêzere kî agahî bigirin.

■ Piştî biryara CNDA yê dawî hatina mafê mayinê.

Mafê we yê mayinê bi dawî dibe:

- piştî xwendina biryara CNDA yê heke ku li dadgeha vekirî tê dîtîn. Hûn ê bi her warî de di der barê vê biryarê de werin agahdarkirin;
- piştî xwendina biryara CNDA yê, ku bi awayek fermî hate dayin.

Tê wateya bi dawî hatina mafê we yê mayinê ye, divê hûn neçarî ku ji nava axa Fransayê derkevin (li beşa 5 binhêrin).

3.3. Ji nûve vekirina mafê serlêdana penaberiye ku hati bû girtin.

Di rewşa girtina daxwaza serlêdana we (li beşa 3.1 ya "Biryara OFPRA yê" binhêrin), hûn dikarin carek ê tenê serî li ji nûve vekirin ê bidin, ev jî piştî biryar dayina girtina serlêdana we di nava 9 mehan da pêk tê. Ji bo vê yekê, divê hûn biçin navenda pêşwaziya yekem ya serlêderên penaber (SPADA) ê û divê hûn li gîşa yekem hûn ji nû de qeyd xwe bikin (li beşa 2 binhêrin).

Ku qeyd kirina we li walîtiyê çê bû û pêve, ji bo ji nû de vekirina mafê we yî serlêdaniyê wê dosyak ji we re bê dayin, divê di nava 8 rojan de vê dosyê ji OFPRA yê re hûn bişînin, da ku serlêdana we ya penaberiya di qonaxa ku ew hatiye seknandin de ji nûve bê destpêkirin.

Ger hûn di nava 9 mehan de carek din serî lê bidin, hûn ê mafê mayina li ser vî erdî bimînin bi dest bixin û belgeyek serlêdana penaberiye ji were tê dayîn.

Piştî derbas kirina serlêdana we bi 9 mehan, daxwaza we ji nû tê vekirîn û wê wekî daxwazek ji nû bê lêniherîn (li 3.4 "Ji nûve lêniherîn" binhêrin).

3.4. Ji nûve lêniherîn.

Piştî ku serlêdana we ya penaberiye ji hêla CNDA yê ve hat red kirin an jî piştî agahdar kirina biryara OFPRA yê ku we di nava mehek ê de îtiraz ne kiribe, mafê we heye ku hûn ji OFPRA yê daxwaza ji nû de lêniherîna dosya xwe bikin, lêbelê ku "tiştên we yê nû" hebin, mîna:

- ku piştî CNDA yê biryara xweda bi rojek ê, an ji dema ku ew biryar hatiye girtin û hûn ji vê biryarê agahdar bûne;





- û ku di rewşa vegerandina we de, ihtîmala ku jiyana we têkevi nava xetereyên ciddî û divê hûn van xeteriyên bidin xuya kirin.

Hûn dikarin ji komeleyek an parêzerek kî zedetîrîn agahî bigirin.

Ji bo vê yekê, divê hûn biçin navenda pêşwaziya yekem ya serlêderên penaber (SPADA) ê û divê hûn li gîşa yekem ji nû de qeyd xwe bikin (li beşa 2 binhêrin).

Divê piştî qeyd kirina serlêdana we bi 8 rojan hûn daxwaziya xwe ya ji nû de lêniherîne pêşkêşî OFPRA yê bikin. Ger daxwaza we ne tamam be, wê nûner ji bo tamam kirina dosya we 4 rojê dinê bi di wê ji bo ku hûn karibin dosya xwe tamam.

Wê OFPRA dûvre dest bi lêkolîna pêşîn a serlêdana we bike û piştî bi dest xistina daxwza we, wê di hundirê 8 rojan de biryara qebûl kirina serlêdana we diba an na be bide. Di dema vê lêniherîne de, ji bo hevpeyvinê ne pêwîste ku hûn bîna gazî kirin.

Di encamê vê lêkolîne de di be ku OFPRA, daxwaza we ya ji nû ve lêniherîne qebûl neke, ger ku delîlên ku we daye kêma bê dîtî û xederiyêk zêde neyê dîtî dibê ev neyê qebûl kirin û ihtîmala girtina mafê parastina we çê nebi.

Ger OFPRA daxwaza we bipejirîne û qebûl bike, ew ê li gora ku li jêrê hatiyê destnîşan kirin wê bê lêkolîn û çareser kirin kû ev biryar ne dinava pêvejoya lezgîn de be.

Ku ev biryara lêniherîne carekêdin ji hêla OFPRA yê bê red kirin dikari bive mijara ji nû ve îtiraz kirina li pêşiya CNDA yê (li beşa 3.2 binhêrin).

Piştî ji nûve lêniherîna serlêdana we ya penaberiye gelo mafê we yê mayîna li ser vê axê heye an na?

Di rewşa yekemîn a daxwaza ji nû de dosya wê be lêniherîn (li beşa 3.1 "Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê" binhêrin):


- ger ku daxwaza we ji aliyê walîtiyê ve tenê bi mebesta dem dirêj kirinê û ji bo pêşî girtina biryara derxistin kirinê bê dîtî û ji aliyê OFPRA yê ve ku ev serlêdana we ne yê qebûl kirin, mafê we yê mayîna li ser vê axê bi dawî dibe û piştî biryara ku ji hêla OFPRA yê hate dayin û pêve dibe ku ev biryara dersînor kirinê bê pêkanîn;

- ger OFPRA biryara serlêdana we qebûl neke, mafê we yê mayîna li ser vê axê na mîne, lêbelê ku walîtî vê serlêdana we tenê ji bo dirêj kirina biryara derxistin kirinê ne bîna hûn dikarin vê biryara derxistin kirinê ku li piştî biryara OFPRA yê hati ye dayin, heta ku serlêdana vê biryarê li pêşiya CNDA yê bê kirin, hûn dikarin ji bo rawestandina vê biryara derxistinê serî li dadgeha îdarî bidin;

- ger ku OFPRA biryara lêniherîna serlêdana we bike, lêbelê di dawîde biryara ku serlêdana we red dibe, mafê we yê mayîna li ser vê axê na mîne, ev piştî biryar dayina OFPRA yê pêve tê hesibandin û hûn dikarin vê biryara derxistinê ku ji bo we hatiye dayin li pêşiya CNDA yê îtiraz bikin û heta ku ew li serlêdana we binerî, hûn dikarin ji bo rawestandina vê biryara derxistinê serî li dadgeha îdarî bidin;

Di rewşa ku daxwaza duyemîn a ji nûve lêniherîna serlêdana we de, hûn ne karin ji mafê mayîne sîd werbigirin. Dibe ku beriya bersiva biryara OFPRA yê di derbare we de biryarek derxistinê bê girtin û ev biryar bê pêkanîn.





4. Şert û mercên serlêderên penaber û mafê girtina materyalên pêşwazî kirinê

Hûn wekî kesekî serlêderên penaber, mafê we heye ku hûn ji maf û mercên materyalên pêşwaziya kirinê sûd werbigirin:

- cihêk mayinê, li navendek pêşwazîkirina serlêderên penaber (CADA) an navendek lezgîn, ji bo we û endamên malbata we (li beşa 4.1 binhêrin);
- alîkariyêk mehane ji bo serlêderên penaber (ADA), mîqdara wê li gora hêjmara malbata we tê destnîşan kirin (li beşa 4.2 binhêrin).

Pêşniyarek lêniherîn û mercên materyalên wergirtinê di dema serlêdana we ya penaberiye li gîşa yekem ji hêla OFII yê, ji we re tê pêşniyar kirin (li beşa 2.2.2 binhêrin).

Her wiha ji bo prosedurên wê yên îdarî û civakî de hûn ji piştevaniyê sûd werdigirin da ku şopandina pelê serlêdana we ya penaberiye û gihîştina mafên civakî ku ji we re hatinin dayin, bi taybetî di warê perwerdehî û tenduristî (li beşa 4.3 û 4.5 binhêrin).

4.1. Cihên mayina serlêderên penaber.

■ Cihên mayinê.

Cihên mayinê ji bo serlêderên penaber navendên pêşwazî kirinê (CADA) û tevahiya cihên lêzgîn ên ji bo serlêderên penaber (HUDA) ne. Tevahi ya çûyinê cihên mayinê ji hêla dewletê tê fînanse kirin. Ew bi piranî ji aliyên komeleyan ve tene birêve birin.

Nêzîkî 100,000 cihên mayine ên ji bo serlêderên penaber li seranserê axa Fransayê hatine belav kirin henin, bi şewayê apartmanan, navendên kolektîf an odeyên otêlane. Di be ku hûn li CADA û HUDA yê, bi hin kes an hin malbatên din re odeyên xwe (metbexê, serşokê, tûwaletê) hevpar bikin.

Ji bo ku hûn mafê mayinê li van cihan bigirin, divê ku hûn xwediyê belgeya serlêdana mafê penaberiye bin.

Hûn ê li CADA û HUDA yê, desteka îdarî û hiqûqî di pêvajoya penaberiye û piştgiriya tenduristî û civakî de sûd werbigirin (vekirina mafên civakî, gihîştina lêniherînen tenduristî, dibistana zarokan, û hwd.). Ger ku hûn li odeyek otêlek ê de cih digrin, hûn dikarin ji van alîkariyan li saziya yekem a ji bo pêşwazî kirina serlêderên penaber (SPADA) sûd ê werbigirin.





■ Şandina cîhê mayinê.

Mercên dayina materyelên pêşwazî kirinê ku ji aliyê (CMA), alîkariya ji bo serlêderên penaber (ADA), ji hêla OFII yê li gîşa yekem (GUDA) yê, ku hûn yekem car serlêdana xwe ya penaberiye qeyd dikin ji we re te pêşkêş kirin:

- **ger hûn van pêşniyarên lêniherîna red bikin**, hûn ne karin ji nûve ji lêniherînên CMA yê sûd werbigrin.
- **ger hûn van pêşniyarên lêniherîna qebûl dikin**, OFII wê li gorî şêwaza weya penaberiye û li gorî derfetên henin, li bajar, herêm an li tevahiya nava axa Fransayê, cîhek li CADA an cîhê mayina lezgîn li (HUDA) yê wê ji we re pêşniyar bike.

Dibe ku cîhek ji derveyî bajar an herema ku we serlêdana xwe ya penaberiye qeyd kiriye, ji were bê pêşkêş kirin. Ger hûn vê pêşniyarê red bikin, êdî hûn ê ne ma karibin alîkariya ADA yê bistînin û tu cîhên din en mayinê ji we re na yê pêşkêş kirin.

Ku ji we re cîh ne yê peyda kirin, wê OFII we bişîne SPADA yê, heya ku ji were li cîhê kî bigere.

■ Pejirandin û derketina ji cîhên mayinê.

Ger hûn di CADA an HUDA yê de bêne qebûl kirin, hûn dikarin di tevahiya dem dirêjehiya pêvajoya xwe ya penaberiye li (OFPRA û CNDA) wir bimînin.

Lêbelê, di hin rewşên ku biryara negatîf ji hêla OFPRA yê ji bo we hate dayin û pêve hûn tenê di karin di demek bi sînor li vir bimînin (li sernava "Kengî dayina derfetên materyala ji bo we bi dawî dibe?" li nava beşa 4.2 binhêrin).

Ger ku ji we re statuya penaberiye yê an jî parastina duyemîn hate dayin (biryara dawîn a erênî ji hêla OFPRA an CNDA), divê hûn di nav sê mehan de ji CADA an HUDA yê derkevin, ji bo yek carê ev tê nû kirin. Ger hûn di vê demê de ji cîhê mayinê dernekevîn, hûn ê bi biryara dadwer bînin derxistin.

Ger ku biryara serlêdana we ya mafê penaberiye ne erênî hat (biryara dawîn ya OFPRA an CNDA), hûn neçar in ku ji CADA an HUDA yê derkevin, bi dawî bûna mafê we yê mayina li ser vê axê (li sernavên "dawiya mafê parastinê" di beşên 3.1 û 3.2 binhêrin) de ji bilî ku di qanûnê de hatiye destnîşan kirin.

Ger hûn di vê demê de ji cîhê mayinê dernekevîn, di bê ku pevajojek derxistinê ji bo we bê destpê kirin. Di vê çerçovê de, hûn ê ji hêla walîtî ya bajêr, an rêvebirên CADA yê an jî yên HUDA yê ve werin derxistin ji bo ku hûn cîhê xwe vala bikin. Di bûyereke wanî de ku hûn pêk neynîn, wê serokê walîtî ya bajêr, an rêvebir, dikare serî li dadgeha îdarî bide û fermana hûn cîhê mayinê vala bikin derbixe. Ger pêdivî bê dîtin, hûn ê bi piştgiriya hêza polîsên niştimanî an cendirmeyî bêne derxistin.





4.2. Alîkariya ji bo serlêderên penaber (ADA).

Bi rêvebirina alîkariya ji bo serlêderên penaber (ADA) ji hêla OFII yê ve tê kirin û pereyên ku ji we re tê dayin ji hêla Dezgeha xizmet û tezmînê tê dayin.

Ev alîkariya ku ji we re tê dayin, bi rêya kartekê ku ji hêla OFII yê ve ji we re hatî ye dayin pêktê û heya ku hûn wekî serlêderên penaber bin, û mafê we ya mayîna li ser vê axê hebi, an heya ku şandina we ji bo dewletek din a berpirsiyar ku heta lêniherîna serlêdana we ya penaberiyê bi dawî bibe tê dayin.

■ Şertên ji bo sûd wergirtinê.

Ji bo ku hûn ji alîkariyên serlêderên penaber sûd werbigirin, divê hûn xwediyê:

- 1- belgeya serlêdana penaberiyê bin;
- 2- hûn ne kêmî 18 salî bin;
- 3-hûn kesek kî ji serlêderên penaber bin, û li gîşa yekemîn we pêşniyaz û defetên ji aliyê OFII' yê ji were hatiye kirin we qebul kiribi.

Ma ez dikarim ji derfetên materyala bêyî ku belgeya serlêdana penaberiyê sûd werbigirim?

Wekî ku li jor hatî destnîşan kirin, divê hûn belgeyek serlêdana mafê penaberiyê bigirin da ku hûn bi karibin derfetên wergirtina materyala sûd werbigirin.

Lêbelê, heke we daxwaza ji nûve lêniherîna serlêdana penaberiyê kiribe an heke we serlêdana xwe ya penaberiyê pir dereng dabi, bêyî sedemek qanûnî be, ji derfetên girtina materyalên ku ji bo pêşwazî kirina serlêderên penaber tê dayin hûn ne karin bigirin û ev tê red kirin (li beşa 2.2.1 "Beriya kirina serlêdana we ya penaberiyê" binhêrin), tevî ku belgeya we ya serlêdana penaberiyê hebe jî.

Wekî din, ku serlêdana we ji aliyê OFPRA yê ve hatibe red kirin û serlêdana we ya penaberiyê ne ma bê dirêj kirin, û ku ji ber hin sedeman serlêdana we ya penaberiyê di bin pêvajoya lezgînde ku tê mêtandin (welatê xilaf ê aram, tehlûkeya ciddî ya ji bo civaka giştî), an jî ku belgeya serlêdana we ya penaberiyê ji we hatibi sitandin, domandina derfet û mafê dayina materyala heta ku piştî biryara OFPRA yê û di doza we ya li pêşberî CNDA yê tê dayin, ku dadwer li ser rewşa wê biryar da (dadwerê îdarî an dadwerê mafê penaberan). Di van rewşan dayina alîkariya maddî dibe kû we re guherandin an li şûna wê alîkariyê alav bîn dayin divê ev yek jî baş bê diyar kirin.

■ Formûl kirina daxwazê.

Ger hûn serlêderên penaber bin, piştî qeyd kirina serlêdana we ya penaberiyê mafê we yê alîkariyê li gîşa yekem tê vekirin, û ev yek ji mijara pejirandina pêşniyara serlêdana we ya penaberiyê ye, ev heqên we ji hêla OFII yê tîn pêşniyar kirin û qebûl kirin vana li ser daxwaza we ye.

Hatina vê alîkariyê ji we re piştî radestkirina serlêdana we ya penaberiyê ji OFPRA yê, û piştî qeyd kirina serlêdana we ya penaberiyê herî zêde piştî 21 rojan pêve tê dest pê kirin.





■ Mîqdarê alîkariyê.

Ji bo ku hûn karibin ji alîkariya serlêderên penaber sûd werbigrin, divê çavkaniyên we ên aborî ji hatina alîkariya mehane (RSA) kêmtir be.

Ev alîkarî li gora hejmara malbata we û pêwîstiyên wan û çavkaniyên we ên aborî û bi şewayê bi cîh kirina we tê hesabandin.

■ Çawa tê şandin.

Şandina cara yekemîn a vê alîkariya ji bo serlêderên penaber piştî ku daxwza serlêdana we ji aliyê OFPRA yê hate qebûl kirin û pêve tê destpê kirin. Ger we hejmarêk mobîle dabi OFII yê, ji şandina peran ser karta we hûn ê bi riya SMS kê bîn agahdar kirin.

Şandina vê alîkariyê ji we re heya dawiya meha ku mafê we yê mayîna li ser axa Fransayê heye tê kirin (li beşên 3.1 û 3.2 "Beşên mafê parastina" binhêrin).

Dayîna vê alîkarî heta dawiya meha ku, biryara dawîn a di derbarê serlêdana we ya penaberiye bê dayîn didome.

■ Îtiraz kirin.

Divê hûn buroya wezîfedar ya herêmê OFII yê, ji tevahî guhertinên kesane û ên bi rewşa malbata we re girêdayî, di derbarê mafê mayîna we, çavkaniyên aborî, û kar bi awayek lezgîn agahdar bikin.

Ku niqaşêk di derbarê dayîna ADA yê de ji hêla OFII yê derket, hûn dikarin ji bo gilî kirina OFII yê serî li dadgeha îdarî bidin ev dibin berpirsiyariya we de ye.

Kengî dayîna derfetên materyala ji bo we bi dawî dibe?

Sûd wergirtina we ji derfetên materyalên pêşwazî kirinê, di dawiya meha ku mafê we yê mayîne û dawî hatina dema belgeya we ya penaberiye di qede bi dawî dibe.

Serlêderên penaber, ku serlêdana we ji aliyê OFPRA yê hatibe red kirin û ku ji ber hin sedeman serlêdana we ya penaberiye dinava pêvajoya lezgîn tê mêşandin (welatê we wek welatek ewlehî tê dîtin, hebûna we tehlûkeya ciddî dide civaka giştî) dikarin ji girtina materyalan sûd werbigrin heta ku dadgeh biryara derxistinê bigre an heta CNDA serlêdana we ya penaberiye red bike (li beşa 5.1 binhêrin).

Ger we mafê penaberiye an jî mafî parastina duyemîn girt, ev alîkarî di dawiya paşîya meha ku hûn ji biryarê hatinin agahdarkirin bi dawî dibe.

Lêbelê, dibe ku derfetên girtina materyalên pêşwazî kirinê bi dawî bibin:

- ku bê sedemek qanûnî, hûn dev ji cîhê xwe yê mayîne berdin;
- ku hûn rêzgirtinê ji rayadarên berpirsiyar nekin, bersiv nedana daxwazên agahdariyê an jî ku di derbarê pêvajoya we ya serlêdaniya penaberiye de we bersiv ne dabi, û hûn ne çûbin hevpeyvîna kesane;
- ku ji aliyê OFII yê ve biryara şandina we ya cîhê mayîne SPADA an li herêmek din derketi be, lê we di nava pênc rojên ku pêwîst bû hûn ne çûbin;
- ku ji aliyê OFII yê ve hûn ji bo li herêmek din hatibin şandin û we bêyî destûrê OFII yê we wê derê terikan dibe;
- ku we çavkaniyên xwe yê aborî veşarti bin;
- ku we agahdariyên derew û ne rast li ser rewşa malbata xwe da bi;





- ku we di bin nasnameyên cûda, cûda we serlêdana penaberiyê kiribe;
- ku we zagonên cihê mayinê binpê kiri bê an we zerarek ciddî dabi wî cîhî.

Piştî ku rapora nivîskî ya çawdariyên ku li ser we hatin kirin ji OFII yê re bê şandin û pêve wê di derbarê we de biryar bê standin. Dibe ku di hin rewşan de vegerandina alîkariya peran ku bi neheqî hatiye dayîn wê ji we bê daxwaz kirin, wek veşartina çavkaniyên xwe yê aborî, ragihandina agahdariyên şaş li ser rewşa malbata xwe û serlêdanên penaberiyê yê di bin nasnameyên cûda de.

4.3. Gihandina perwerdê.

Gihandina pergala perwerdê ya ji bo zarokên penaber weke a hemû hemwelatîyane.

Li gorî Qanûna Perwerdehiyê (benda L. 111-2), "her zarok xwedî mafê perwerdehiya dibistanê ye, divê ku malbata wî bi awayek çalek beşdarî perwerdehiya wî bibe". Tête bîranîn ku "*perwerdehî ji bo her du cinsane, fransî û biyanî, hemû zarokên ku temenê wan di navbera 6 û 16 salîn de mecbûrî ye*" (benda L. 131-1 koda ya jorîn).

Qeyd kirina li dibistana seretayî li şaredariyê tê kirin. Pêwîste hûn belgeyên xwe yê ku girêdana we bi zarokê we re, navnîşana we û ku zarokê we hatin derzî kirin hûn pêşkêş bikin.

Qeyd kirina zarokên we li dibistanek navîn (li lîsê an kolej) rasterast li dibistana herî nêzîkî cîhê ku hûn rûnidinê pêk tê.

Saziya ku berpirsyarî û piştgirîya we ya îdarî dike di warê, qanûnî û civakî, dayina cîhê mayinê an bi cîh girtina we ya li saziya pêşwazî kirinê (SPADA) ku hûn dikarin bi cîh bibin an na tevahî girêdayi peyman a ku we bi OFII yê re kiriye pêk tê (li xala 2.1 binhêrin), divê di avêtina van gavan de ji we re bibin alîkar.

4.4. Gihandina lêniherînên tenduristî.

■ Li ku dermankirin di be?

- **Li gel pisporek tenduristiyê (li derveyî nexweşxaneyê)**

Ji bo hemû pirsgerêkên tenduristî, hûn dikarin li gel bijîşkek "giştî" werin lêniherîn û dermanên ku ji bo we pêwîste wê bê dayin. Heke, pêwîstiya we bi lêniherînek cûda hebe ewê we bişîni berbi bijîşkekê "pispore" an cîgirê bijîşkî (hemşîre, fizyoterapî, hwd.).

- **Li dermanxaneyê:** hûn dikarin derman bikin, an jî hûn dikarin pirsên bijîşkî bikin.
- **Li nexweşxanê:** di rewşek awarte de, an ji ku pêwîstî hebe ji were hin test wê bînin çêkirin û hûn ji aliyê kesên şewirmendên pispore bînin lêniherîn.

Ev derman kirin ne belaşê, lê li gora rewşa we dikari ji hêla sîgorteya we ya tenduristiyê bê dayin (li paragrafa jêrîn binhêrin).

Dema ku hûn li hêviya vekirina mafê xwe yê lêçûnên tenduristînin, hûn dikarin ji van saziyên jêrîn dermanê xwe belaş bistînin:

- Ji bo hemû dermankirinê:
 - hûn dikarin biçin nexweşxaneyê û hûn dikarin ji bo alîkariya belaş ji bo lêçûnên tenduristiyê daxwaza (PASS) ê bikin, bi gelemperî li nexweşxaneya ev maf tê dayin. Hûn ê ji hêla bijîjkan ve bînin lêniherîn û wê dermanê wê belaş bê dayin.





- Hin komeleyên pispor ên mîna (Doxtorên Cîhanê, COMEDE ...) pêşniyarên belaş ên lêniherîn û derman dayinê dikin, ji bo doxtorê giştî, doxtorê diranan, an pisporên mîna vana (jinekolojiyê, doxtorên çava , an ên psîkolojîk, hwd.) dikin.
- Ji bo pirsgerêkên taybetî:
 - Ji bo çavdêriya jinên ducanî, çavdêrî kirin û derzî kirina zarokên dibin ya 6 salî: li navendên PMI (Parastina Zarok û Dayik ê) tê kirin.
 - Ji bo şopandina tuberkulozê (werem): li CLAT (navenda kontrolkirina tuberkulozê)
 - Ji bo şopandina AIDS, hepatît û enfeksiyonên cinsî: li van navendên belaş ên agahdarî û diagnostîkî (CeGIDD).
 - Hebên ji bo pêşîlêgirtina ducanî bûnê : li navenda plansazkirina malbatê (CPEF) tê dayin.
 - Ji bo kêsên ku elimandinê xerap: Navenda lêniherandin, piştgirî û pêşîlêgirtina elimandinê xerap (CSAPA)

Ji bo ku hûn cîhên van saziyan peyda bikin, serî li saziya ku we pêşwazî kiriyê an nexweşxaneyê ku hûn lê tîn derman kirin bidin ji bo ku agahdarî û derman kirina we pêk bê <http://annuaire.sante.ameli.fr>

Di rewşên awarte de, telefonî hêjmara 15 an jî 112 bikin, an jî ger hûn ne karin telefonê bikin biçin beşa lezgin a nexweşxaneyê herî nêzîkî we.

■ Hûn çawa dikarin alîkariyê ji bo lêçûnên tenduristiya xwe bidest bixin?

Li Fransayê, ji bo lêniherînên tenduristî pere tê dayin lê hûn dikarin ji mafê lêniherîn û derman kirina tenduristiyê sûd werbigirin, an hemî an jî perçeyek ji lêçûnên we yê derman kirinê tê dayin.


Vana bi rêka alîkariya Parastina Tenduristiya Gerdûnî (PUMA) û bi Hevkarîya Lêniherîna Tenduristiya a Temamkar" (CSS) ne tîn dayin. Ev li gor rewş û çavkaniyên we en aborî tîn dayin.

Ev îmkanê ku tîn dayin, ji bo protezê diranên we, berçavkên we hwd. û ji bo hemî lêniherînên we en rojanene. Digel vê yekê, bi rêka Lêniherîna Tenduristiya Temamkar hûn dikarin hemû dermankirinê xwe û lêniherînê xwe en lezgin, bi avayek baştir pêk bivin û hûn dikarin ji lêçûnên çûn û hatinê jî sûd werbigirin.

Hûn dikarin ji wê fona sîgorteya tenduristî ya seretayî ji (CPAM) a herema weya rûniştinê daxwaz bikin:

- **piştî ku we qeydkirina serlêdana penaberiyê a ji bo zarokên xwe yê piçûk çêkir:** divê ku hûn formên ji bo "Daxwaza vekirina mafê Sîgortaya Tenduristiyê" dagirin û "Daxwaza hevkarîya Lêniherîna Tenduristiya a Temamkar" û pêre belgeya serlêdana penaberî ya ku li ser wan xuya dike bişînin;
- **piştî 3 meh rûniştina we li Fransayê (an ji bo jina we an jî ji bo mêrê we):** divê hûn ji nû ve van forman dagirin û ji wan re bişînin, ji bilî belga serlêdana weya penaberiyê, delîlên ku hûn sê meh li Fransayê rûniştinê bidin berhev kirin, mînak: belgeya weya rûniştinê ya ku ji bo 3 mehên pêşîn ku ji hêla navendek rûniştinê ve ji bo we hatî amadekirin; belgeya navnişana weya ku ji zêdetirî 3 mehan hatiye dayin; belgeya weya daxwaza serlêdana mafê penaberiyê ku ji zêdetirî 3 mehan hatiye dayin; hemû belgeyên ku divan 3 mehan ve ji hêla saziya pêşwazîkirinê ya serlêderên penaberan (SPADA) ve hatî şandin; di rewşa rûniştinê jî aliyê kesek e sêyemîn de hatibi kirin, divê belgeyek li ser rûmeta vî mirovî ku sondê dixwe bi dîroka destpêka rûniştinê bi delîlên navnişê diyar dike (fatûrê kirê, fatûrên ceylanê...) en ku ji bo 3 mehên dawîn hatine dayin hwd.





Heke hûn an jî zarokên we hewceyê bilez dermankirinê ne, hûn dikarin belgeya hewceyê lêniherîna bilez tekin nav belgeyên xwe, da ku hûn karibin zûtirîn belgeya mafê tenduristiyê bidest bixin û zûtirîn ji vî mafî sûd werbigirin.

Di vê demê de saziyên ji pêşwazî kirina we ber pirsiyarin (SPADA), navendên mayînê, (CADA, HUDA) û nevenda ku hûn lê dimînin, çalakgerên civakî ên nexweşxaneyan dikarin divî warîde ji we re bibin alîkar.

Mafê we yê tenduristiyê, roja ku hûn dosyaya xwe ji CPAM-ê re dişînin dest pê dike. Ji ber vê yekê girîng e ku hûn daxwaziya xwe û a zarokên xwe bêyî ku hûn dereng bikevin (dema ku daxwaziya weya penaberiyê hate qeyd kirin) bikin, û bi qasî ku hûn dikarin 3 mehên rûniştina xwe a li Fransa ji bo we û hevalê jiyana we bidin destnîşan kirin.

Hûn ê belgeyek werbigirin û ji bo dermankirinê bijîşkî, nexweşxane an dermanxaneyê re hewce ye ku hûn vê belgeyê pêşkêş bikin. Ew ji hêla saziya ku li ser formê hatiye diyarkirin ji we re tê şandin: divê hûn li ser formê navnîşana xwe û cîhê xaniyê xwe baş destnîşan bikin.

Hûn ê di tevahiya pêvajoya penaberiyê de feyde bigrin, û paşê jî eger we mafê parastina navneteweyî stend jî hûn ê sûd werbigirin. Ji ber ku ev alîkariya tenduristiyê nêzikî 1 salê derbas dibe, divê hûn her sal dosya xwe ji nû ve amade bikin da ku hûn karibin sûdê ji wê werbigirin, herî baş beriya ku dema weya salekê bi qedi navbera 4 û 2 mehan de serlêdana xwe nû bikin.

Heta ku hûn li benda vebûna mafên xwe dimînin, weke ku di beşa berê de hatiye destnîşan kirin "li ku dermankirin di be?" binherin hûn ê karibin li wan saziyana, hemû lêniherînên xwe belaş derman bikin.

Wê "lêniherîna lezgîn" a we ya li nexweşxaneyê jî bê dayin. Ev dermankirinên ku nikarin bimînin, mînak: lêniherîna ji bo birînek kûr, şikestinek, şewitandin, nexweşiyek cidî an ku belav dibe, lêniherîna keçên piçûk û jinên ducanî têne kirin (di nav de pêşîlê girtina nexweşî yê ku di dema ducaniyê de û piştî wê, ji dayikbûna zarokan, xwedêdan, û hwd.). **Dema ku hûn divan rewşande diçin nexweşxaneyê ji bo hûn belaş bîr dermankirin divê hûn belgeya xwe a serlêdana penaberiyê pêşkêşî wan bikin.**

BÎRVEANÎN:

Hûn dikarin piştî qeyd kirina serlêdana xwe ya penaberiyê, ji bo zarokên xwe yê piçûk, serî li CPAM a herema xwe ya ku hûn lê dimînin bidin, lê ji bo we û hevalê jiyana we divê hûn 3 mehan bimînin.

Di dema ku hûn li benda mafê vekirina tenduristiyê ne, hûn dikarin di hin saziyan an jî ji bo "lêniherîna lezgîn" li nexweşxaneyê belaş bîr derman kirin: belgeyq xwe a serlêdana penaberiyê destnîşan bikin.

Divê hûn CPAM ê ji tevahî guhertin û rewşa xwe agahdar bikin: dema ku we sûd ji parastina navneteweyî stend, divê kopiyek ji belgeya xwe ya nû ya serlêdana penaberiyê ku we serîli karta mafê rûniştandinê dayi, û kopîk belgeya navnîşana xwe ya nû, divê hûn bişînin.

4.5. Gihandina bazara xebatê.





Wekî serlêderên penaber, dibe ku hûn destûra xebatê bistînin ev jî ber sedema ku OFPRA di nava şeş mehan de di derbarê, danasîna daxwaziya we ya serlêdana penaberiye de ku ti biryar ne dabe û ev dem piştî qeyd kirina serlêdana we pêve tê hesabandin.

Divê rewşê de, ji hêla kardêrê wê yê pêşerojê divê daxwazek ji bo destûra xebata wê bê amadekirin û pêşkêşî servîsa kargêriyê (SMOE) yê DIRECCTE a bajarê ku hûn lê dimînin bikin, ji bo ku hûn karibin mafê xebatê bi dest bixin.

Biryara serlêdana destûr dayina kar ji hêla walîtî yê /DIRECTE/SMOE ve tê dayin, bersiva wê daxwazname di nava du mehan de tê dayin. Ku dinava du mehan de we tû bersiv negirt, wek ku destûr ji we re ne hatî dayîn tê hesabandin. Ku qebûl bû hûn û karderê we yê pêşerojê tevde têne agahdarkirin, û ev maf li gora mayîne li ser vê axê tê dayin.

Di rewşa ku biryara erenî hate dayin, wê walîtî ji OFII yê re destûrnameya kêr û peymanên ku zêdetirî 3 mehan dom dikin an peymanên xebatên dem salî wê bişîni.

Lêbelê, ev destûrdayin dikare ji we re ne yê pejirandin, ev jî tekîldarê rewşa karderê we, û ji ber sedemên herema ku hûn lê dimînin, an sektora ku hûn serî lê didine, ku karê hûn serî lê didin ne di nava listeya pêşîn a ji bo karên ku pêwîstî lê heye ne hatibe destnîşan kirin.

Ku destûra xebata demkî ji were hate dayin, di rewşa qutkirina peymana we ya kar ku ne bi we girêdayibe, ku hûn ne hatibin qewirandin an peymana we ya demkin be, piştî bi dawî bûna peymana we ya kar hûn di karin wek kesekî li kar digeri, serî li Pôle emploi yê bidin û qeyda xwe li vir bikin.

Ger temenê we piçûk be û hûn bi tenê bin hûn dikarin ji destûr dana xebatê a ji bo peymanek şagirtî an profesyonel ya demîkî sûd werbigrin û hûn dikarin ji bo şopandina peymana xwe alîkariyê bigrin, ku serlêdana we ya penaberiye ji 1ê Adara 2019 an û pêve hatibe kirin.

Di encamde, heger hûn di nava bazara kedê de werin pejirandin, hûn ê ji van şert û mercên ku bi qanûna kedê ve girêdayî, ji çalakiyên perwerdehiya profesyonelî sûd ê werbigrin.

5. Di encamê red kirina serlêdana mafê we yê penaberiye û dawî hatina mafê mayina we li ser vê axê

5.1. Biryara red kirinê ji alîyê OFPRA an CNDA yê.

■ Dawî hatina mafê îtarazkirina biryara OFPRA yê.

✓ Îtiraz kirina li pêşîya CNDA na yê sekinandin:

Lêbelê we ke kû dinava beşa 3.1 hatiye destnîşan kirin, mafê we yê mayîne kengî bi dawî dibe, dema ku hûn têkevin yek ji nav mijarê jêrîn yên biryarê OFPRA yê:

1. biryara negatîf dibe ji ber sedema ku we li dewletek din parastinek bi bandor girtibe, ger ku ew Dewlet ne endamê YE be, dikarin wê bişînin (li beşa 3.3 binhêrin);
2. biryara qefaltinê (li beşa 3.3 binhêrin);
3. piştî serlêdana we ya ji nû ve lêniherînê hatibi red kirin ku ev serlêdana we tenê ji bo seknadina derxistinê hatibe kirinê bê dîtin.





Di van rewşan de, dibe ku belgeya we ya serlêdana penaberiye paşve we re xistin an jî ne yê nûve kirin û dibe ku hûn mecbûrî derketina ji nava axa Fransyê bên kirin. Îtiraza we ya li pêşiya CNDA yê na yê wateya ku biryara we ya dersînorkirinê bê rawestîn û ev biryar dikari di heman demêde we re pêkanîn. Ger we OFPRA ji vekişîna serlêdana xwe ya penaberiye agahdar kiri be, hûn mafê xwe yê parastinê wenda dikin û îtiraza we ya li pêşiya CNDA yê vê biryarê na di seknandin.

✓ **Îtiraz kirina li pêşiya CNDA yê hemû biryara otomatîk na sekînine:**

Mayîna we ya li ser vê axa niştîmanî kengî bi dawî dibe, dema ku hûn têkevin yek ji nav mijarê jêrîn yê biryarê OFPRA yê:

1. piştî serlêdana we ya ji nû ve lêniherînê hatibi red kirin û ku ev serlêdana we tenê ji bo seknadina biryara derxistinê kirinê bê dîtin.
2. biryarek red kirinê dibe li ser daxwaza ku wê ji bo ji nû de lêniherîna dosya xwe kiribû ev ne hatibe pejirandin;
3. dibe biryarek red kirinê di derbarê serlêdana we ya penaberiye hatibe dayin ku pêvejoya lêniherîna dosya we dinava prosedûra lezgîn de ye û ev jî ji ber ku hûn ji welatek ewlehî hatinin;
4. dibe biryarek red kirinê di derbarê serlêdana we ya penaberiye hatibe dayin ku pêvejoya lêniherîna dosya we dinava prosedûra lezgîn hatiye bicîh kirin, ji ber ku hebûna we ya li ser vê axa netewî ji bo ewlehiya giştî xeterek ciddî tê dîtin;
5. ku biryara dersînorkirinê ji were hatibe dayin, qedexeyek mayîna we ya li ser vê axê ku ji hêla rêveberiya îdarî an ji hêla dadwer ve hati be dayin (li beşa "Ku biryara dersînorkirinê ji we re hatibe dayin, qadexa mayîne we li ser vê axê hebe û ev biryar ji hêla rêveberî an dadgeha îdarî ve hatibi destnîşan kirin?" di nava qismê 2.2.1 binhêrin).

Di van rewşan de, dibe ku belgeyên we yê serlêdana penaberiye 1 an 4 bêne paşve girtin an jî neyên nû ve kirin û dibe ku hûn mecbûrî terk kirina ji nava axa Fransyê bên kirin.

